# NÛÇE Û ZAROK

## PIRTÛKA DESTAN A NÛÇEGIHANIYA ZAROKPARÊZ

Umay Aktaş Salman

IPS İletişim Vakfı Yayınları

**Nûçe û Zarok**
Pirtûka Destan a Nûçegihaniya Zarokparêz

© Weqfa Ragihandinê ya IPSyê
Nivîskar: Umay Aktaş Salman
Edîtor: Ezgi Koman
Wergêr: Ferid Demirel, Murat Bayram, Abdulselam Yıldırım
Sibat 2019

**Weqfa Ragihandinê ya IPSyê**
Faik Paşa Yokuşu No: 37/7-8 Kat:3
34430 Beyoğlu, İstanbul
Tel: +90 212 2511503
Faks: +90 212 2511609
E-Mail: bia@bianet.org
Web: www.bianet.org

**Hesabên Medyaya Civakî**
https://www.facebook.com/bianetkurdi/
https://twitter.com/bianet_kurdi
https://www.instagram.com/bianetkurdi/

**Xwendina dawîyê**
**MYRA**

Ev piratûk bi piştgiriya aborî ya Ajansa Geşepêdan û Hevkariyê ya Navnetewî ya Swêdê (SIDA) hatiye weşandin. Loma jî bi tu awayekî wek nêrînên fermî yên SIDAyê nayên nirxandin.





# NAVEROK

**Derbarê projeyê de** ..... 5
**Nêrîna weqfê** ..... 6
**Çi pêwîstî bi vê pirtûkê heye?** ..... 8
**Pirtûk ji bo kê hatiye nivîsandin?** ..... 9
**Zarok û mafên wan** ..... 10
Zarok kî ye? ..... 10
Berpirsiyariyên dewletan ên derbarê zarokan de ..... 12
**Li Tirkiyeyê rewşa zarokan** ..... 13
**Nûçegihaniya zarokparêz çi ye?** ..... 16
**Di medyayê de zarok** ..... 18
Çiqas dibin mijara nûçeyan? ..... 18
Kengî dibin mijara nûçeyan? ..... 18
Çawa dibin mijar? ..... 19
**Tevlî mînakan binpêkirinên di medyayê de** ..... 22
Zimanê nûçeyan ..... 22
Bikaranîna dîmenan ..... 26
**Pêşniyarên ku di amadekirina nûçeyan de** ..... 29
Di dema çêkirina nûçeyan de li van tiştan baldar bin ..... 29
Pêşniyazên pratîk ji bo qad û komên zarokan ên cûda ..... 35
Perwerde ..... 35
Tenduristî ..... 37
Cudakarî ..... 37
Karkeriya Zarokan ..... 38
Şer û Pevçûn ..... 39
Zayend, nasnameya zayendî, meldariya zayendî ..... 39
Koçber û Penaber ..... 40
Zarokên bi hewcedariya taybet ..... 41
Zarokên ji hela dewletê ve tên parastin ..... 42
Zarokên ku sûc pê didin kirin ..... 42
Mexdûrên şîdeta zayendî ..... 43
**Ji bo nûçeyan, divê hevdîtineke çawa bi zarokan re bê kirin?** ..... 45
**Nûçeyên mînak** ..... 50
**Serhatiyên rojnamegeran** ..... 58
**Ferheng** ..... 62
**Çavkanî** ..... 69



**Umay Aktaş Salman**

Rojnameger e. Ji Çiriya Pêşiyê ya 2017ê û vir ve li saziya Hewldana Reforma Perwerdeyê weke lêkolîner kar dike, li ser sîstem û polîtîkayên perwerdeyê lêkolînan dike, nivîsan dinivîse. Li rojnameya Radîkalê dest bi rojnamegeriyê kiriye. Weke nûçegihan û edîtor kar kiriye. Di warê perwerdeyê de bûye pispor (2002-2013). Li Al Jazzera Turkê weke nûçegihan xebitî ye (2014-2017). Nûçeyên perwerdeyê di serî de, gelek nûçe, roportaj, dosya û rêzenûçe yên derbarê mafên zarokan û jinan de amade kiriye. Zanîngeha Stenbolê, Zanîngeha İstanbul Ticaretê, Odeya Bijîşkan a Stenbolê, Halkevleri xelat dane wê. Xelata Serkeftinê ya Cemiyeta Rojnamegerên Tirkiyeyê (2016) wergirtiye. Sala 1980ê li Stenbolê ji dayik bûye. Beşa Rojnamegeriyê ya Fakulteya Ragihandinê ya Zanîngeha Stenbolê qedandiye.

# Derbarê projeyê de

Projeya Nûçegihaniya Zarokparêz di navbera Kanûna Paşiyê ya 2018 û Sibata 2019ê de, bi piştgiriya aborî ya Ajansa Geşepêdan û Hevkariyê ya Navnetewî ya Swêdê (SIDA) hatiye çêkirin. Koordînatora projeyê Elîf Unal e.

Ji Fakulteya Ragihandinê ya Zanîngeha Bilgiyê ya Stenbolê dersdêr Prof. Dr. Asli Tûnçê roja 16, 20 û 24ê Nisana 2018ê, di 31 rojnameyên netewî de li nûçeyên derbarê zarokan de nêriye û raporek amade kiriye.

Ali Seçkin Karayolî sêwirandin û pêkanîna Pirtûkxaneya Nûçe û Zarok/ **Nûçegihaniya Zarokparêz** a di çarçoveya projeyê de çêkiriye. Elîf Unalê naverok amade kiriye û edîtoriya projeyê kiriye.

Umay Aktaşê Pirtûka Destan a Nûçe û Zarok/Nûçegihaniya Zarokparêz ya online nivîsandiye û Ezgi Komanê edîtoriya wê kiriye.

# Nêrîna weqfê

Rast e zarok bi awayekî dibin mijara nûçeyan, lê em dibînin ev nûçe bi xwe dibin sedema binpêkirina mafan. Nûçeyên ku behsa jinan û LGBTIyan dikin jî wiha ne. Yanî hûn ji kîjan aliyî ve li meseleyê dinêrin binêrin, lê divê feraseta nûçegihaniya heyî bê serobinkirin û ev rewş ji nû ve were ravekirin.

Pirtûka Destan a Nûçe û Zarok, nûçegihaniya zarokparêziyê dîsa guftûgo dike. Ez ji bo çi dibêjim dîsa, lewre yên dizanin dizanin, li Pirtûkxaneya BIAyê pirtûkeke me heye ku sernavê wê Nûçegihaniya Zarokparêz e.

21ê Kanûna Paşiyê ya 2006ê, em li Enqereyê ne, ji bo guftûgoya li ser nûçegihaniya zarokparêz em ê bi nûçegihanê li Enqereyê û yên li bajarên derdora Enqereyê re biciviyana. Nîvê zivistanê bû û paytext bi berfê tê bîra mirovan... Dema wê sibehê, min ji camê li derve nêrî û ji ber berfê min rê nedît, baş tê bîra min ku ez çawa xemgîn bûm. Ez ditirsiyam ku ji ber rewşa hewayê wê rojnameger nekarîbin werin. Hatin, bi rojnameger û akademisyenên li ser ragihandinê kar dikin re me du rojên gelekî berhemdar û bi kêf borand. Me bernameya xwe di navbera Kanûna Pêşiyê ya 2005 û Hezirana 2006ê li heşt bajaran (Erzerom, Amed, Enqere, Edene, Samsûn, Mûgla, Kocaelî û Ûşak) bi beşdariya kesên ji medyayên herêmî û bi xebatên atolyelan dubare kir. Em her li ser nûçegihaniya zarokparêz sekinîn, me li ser wê nîqaş kir û em hîn bûn. Wê hewldana me, pêşî li avabûna înîsiyatîfên nû vekir ku bi rêxistinên ji derveyî hikûmetan û fakulteyên ragihandinê re hatin avakirin. Her weha ders li zanîngehan hatin dayîn. Em gelekî kêfxweş bûn.

Pirtûka me ya Nûçegihaniya Zarokparêz di encama van kombûnan de derket holê û bû sêyem rêzepirtûka me ya Nûçegihaniya Mafparêz ku Sevda Alankûşê berhev kirine. Alankûş her weha avakara Pirtûkxaneya BIAyêye. Pirtûk di encama pêşkêşiyên Yasemîn Onat-Seda Akço, Serdar M. Degîrmencîoglû, Gulgun Erdogan Tosûn, Încîlay Cangoz, Erhan Ustundag-Kemal Ozmen, Ahmet Şık, Ragip Dûran, Ezgî Koman ku beşdarî li atolyeyên navborî kiribûn û nîqaşên li heman atolyeyan hatibûn kirin de derketibû holê. Pirtûk li hêlekê nûçegihaniya heyî di çarçoveya azadî û mafên zarokan de rexne dike ku em jê re dema "zaroktiyê" dibêjin. Li hêlekê jî bi mînakan dide nîşandan ku divê nûçegihanî çawa bê kirin. Pirtûk bi van taybetmendiyan, bû yek ji pêşekên vî cûreyî û pirtûka dersan a bingehîn. Ev pirtûk di encama wê projeyê de hate amadekirin ku me û UNICEFê bi hev re meşand. Gelek alîkariyên Sema Hostayê, berpirsa ragihandinê ya saziyê di dema amadekirina pirtûkê de çêbûn. Ji ber wê ye ku divê navê Sema Hostayê em bînin ziman.

Pirtûka Nûçegihaniya Zarokparêz di sala 2007ê de hatibû weşandin, pêwistî çêbû ku em sala 2012ê çapa wê ya duyem çêbikin. Ne bêsedem e ku ez çîrokê ji 15 sal berê didim destpêkirin. Wê gavê pirtûka me di encama wan atolyeyan de hatibû amadekirin ku em herêm bi herêm li welêt geriya bûn. Niha cihê Atolye BIAyê bixwe heye û xwediyê bernameyeke daimî ye. Di encama kombûnên me û rojnameger û xwendekarên fakulteyên ragihandinê yên ji çar hêlên welat beşdarî van bernameyên me dibin de em dibin xwedî pirtûke rêber. Em û Nûçe û Zarok bigihêjin hev.

Bi kurtasî, pirtûka Nûçe û Zarok û pirtûkxane êdî li ser komputerê, tabletê û telefonê her gav li ber destê we ye. Hêviya me heye ku êdî wê ti kes di nivîsandina nûçeyan de zarokparêziyê piştguh neke yan jî wê hincetê nebîne ku çêneke.

Ragihandineke din (her gav) mimkun e!

Nadire Mater
*Sibat 2019*

> “Mafên zarokan jî heye. Heke mafên zarokan nebûya wê weke mirovan nehatina qebûlkirin. Kal û pîr ji zarokan re dibêjin ‘Tu çi jê fam dikî, xwe bidî aliyekî, em ê çêbikin’. Lê divê berovajiyî vî tiştî be. Zanyariyên derbarê wan bernameyan de bala min dikişînin ku zarok dikarin beşdarî wan bibin. Xwezî televizyon û rojname derbarê van de zanyariyên zêdetir belav bikin. Hesabekî min ê Instagramê heye. Ez li ser wê, pirtûkên zarokan didim nasîn. Mirov dikare bernameyeke wiha di televizyon de jî çêbike. Yên behsa çalakiyên hunerî dikin, wan didin nasîn hebin wê gelekî baş bibe. Heke ku di nûçeyekê de min karîba nêrîna xwe bianiya zimên, min dixwest bibêjim, çiqas girîng e mirov pirtûkan bixwînîn, binivisînin û wêneyan xêz bikin”.
>
> **Ayaz Gülpınar, Pola 4em**

# Çi pêwîstî bi vê pirtûkê heye?

Ji sedî 30,2yê serjimara cîhanê, ji sedî 28,3yê serjimara Tirkiyeyê zarok in. Lê hindikê nûçeyan li ser zarokan e.

Ji Zanîngeha Gaziyê Feyyaz Firatî sala 2015ê di çar rojnameyên înternetê de (Hurriyet, Haberturk, Sozcu, haberler.com) lêkolînek kiriye. Li gorî vê lêkolînê, **rêjeya nûçeyên derbarê zarokan de tenê ji sedî 1,4 bûye.** Ji sedî 79ê nûçeyan yên çêbûna bûyeran e û derbarê dozan de ye. **Dîsa ji sedî 73ê van nûçeyan, mafên zarokan binpê kirine.***

Weqfa Ragihandinê ya IPSyê di navbera Hezîrana 2004ê û Sibata 2005ê de li nûçeyên 12 rojnameyan nêriye. Rêjeya nûçeyên derbarê zarokan de ji sedî 1 bûye.

Di nava 13 salan de tiştek nehatiye guhertin.

* Nûçegihaniya ‘Ne’Zarokparêz: Di rojnameyên înternetê de pêşkêşkirina nûçeyên derbarê zarokan de û binpêkirinên exlaqî

Zarok di medyayê de tên paşguhkirin. Yan jî piranî li gorî hin qalibên diyar, dibin mijara nûçeyan: “Mexdûr”, “belengaz”, “gumanbar”… Zarok pirtir bi bûyerên neyênî dibin mijara nûçeyan û ev nûçe dema tên çêkirin, piraniya caran ne li gorî berjewendiya zarokan û çareseriya pirsgirêkan tên sazkirin. Ev bi xwe jî binpêkirina mafan e.

Gelo çima serkeftin an jî têkoşîna zarokan kêmtir caran dibin nûçe? Çima di nûçeyan de nêrînên zarokan nîne? Çima nûçeyên derbarê mafên zarokan de tenê di hin rojên diyar de tên çêkirin?

Civak zarokan weke “nîvwelatî” dibîne. Divê medya dema îmaja zarokan ava dike, nehîle ev îmaj vê nêrîna civakê asayî bike. Ji bo ku zarok bikaribin mafên xwe yên bidestxistina zanyariyan û xwedîfadekirinê bi kar bînin, berpirsiyariya rojnamegeran heye. Me ev rêber bi wê nêrînê amade kir ku, him nûçeyên derbarê zarokan de him jî her cure nûçe dikare bi nêrîneke zarokparêz bên amadekirin.

Me her wiha di pirtûkê de cih daye nêrînên zarokan. Me ji zarokan pirsî ku di medyayê de çi heye û dixwazin çi bibînin.

# Ev pirtûka destan ji bo kê hatiye amadekirin?

Ev pirtûka destan ji bo rojnamegeran û ji bo namzetên rojnamegeriyê ne. Ji bo nûçegihan, nûçegihanê fotografan, edîtoran, berpirsên nivîsan, berpirsên weşanê û hemû rojnameger, xwendekarên fakulteyên ragihandinê û akademisyenan e. Her weha ev pirtûka destan ji bo xwendekaran, temaşevanan yanî ji bo wan kesan e ku pirsa gelo bi çavekî zarokparêz lê dinêrî yan lê nanêrî dikin.

# Zarok û mafên wan

"Hefteya borî wê nûnerê xwendekaran bihata hilbijartin. Tenê xwendekarên ku nûnerên polan bûn, dikarîbûn deng bidana. Em çima nikarin dengan bidin? Li dibistanê bi xwe jî ji zarokan napirsin ku ew çi difikirin".

**Asmin Er, Pola 4em**

## Zarok kî ye?

Zarok ew kes in ku hewcedarî û têgihiştineke wan a taybet heye. Li gorî Peymana Derbarê Mafên Zarokan (PMZ) ya Neteweyên Yekgirtî, zarok kesê serbixwe yê xwedî maf û azadiyê ye, zaroktî jî şêweyekî hebûnê ye.

Zaroktî tê maneya statuyekê û kesên temenê wan di navbera 0-18ê de ye zarok in.

## Çima 0-18?

**Qonexeke wisa ye ku pêşketina mirovan di van temenan de gelekî bi lez dibe. Ji mezinan cidatir, di vê demê de hin pêdiviyên taybet ên zarokan çêdibin.**

**Helbet, pêdivî û potansiyelên cida yên her zarokekî/ê heye ku li gorî temen, taybetmendiyên şexsî û derdora ku lê dijî diguhere. Hin welat hene ku sînorên zaroktiyê di bin 18 saliyê de, hin jî di ser 18 saliyê de digirin.**

## Mafên zarokan mafên mirovan e!

Mafên zarokan, mafên mirovan ên ku bi taybet ji bo zarokan e.

Zarok di qonexeke taybet a pêşketina xwe de ne. Gelekî kêm guh didine nêrînên wan. Mafên dengdanê yên zarokan nîne. Dema mafên wan tê binpêkirin, bi hêsanî nikarin serî li rêyên hiqûqî bidin.

Ji ber wê ye ku maf û azadiya wan cida tê ravekirin.

Peymana Derbarê Mafên Zarokan a NYyê (PMZ) belgeya herî bingehîn a derbarê mafên zarokan de ye.

Armanca Peymanê ew e ku jiyaneke 'bi rûmet, bi rêzdarî, azad, wekhev û di nava aştiyê de" ji bo her zarokekî/ê dabîn bike û biparêze.

Ji ber wê ye ku li gel mafê parastinê, azadiya xweîfadekirin, birêxistinkirin û ramanê û mafê beşdariyê ya zarokan dide nasîn ku ji bo weke her mirovî ew jî bikaribin bi pêş bixin.

**Tirkiyeyê di sala 1990î de îmze avêtiye bin PMZyê. Di sala 1995ê de jî pesend kiriye. Bi vî awayî ji bo pêkanîna maf û azadiyên di peymanê de berpirsiyariya xwe ragihandiye. Lê Tirkiyeyê xalên 17, 29 û 30ê qebûl nekiriye ku derbarê perwerdeya bi zimanê dayikê, jîyana li gorî çand û olê û bikaranîna ziman de ye. Komîteya Mafên Zarokan a NYyê ji bo Tirkiye van xalan jî qebûl bike, pêşniyaran li Tirkiyeyê dike.**

## Berpirsiyariya dewletan a derbarê mafên zarokan de

Li gorî PMZyê her dewleta ku peymanê îmze dike, berpirsiyariya sê xalên bingehîn qebûl dike:

- Divê mafên zarokan binpê neke,
- Divê nehêle kesên sêyem mafên zarokan binpê nekin,
- Ji bo maf û azadî pêk werin divê hemû tiştên pêwîst bi cî bîne.

### Nêrîna li zarokan a li dijî nêrîna PMZyê ya NYyê

Dewlet –ji derveyî nêrîna PMZ ya NYyê- zarokan wiha dibînin ku tenê divê bên parastin.

Li gorî nêrîna dewletan, zarok kesên ku hîna mezin nebûne, netemam in û ne vê demê lê wê di rojên pêş de bi qiymet bibin.

Ev nêrîna dewletê, yek ji encamên nêrîna civakê ya li zarokan e. Û di heman demê de dihêle ku ev nêrîn di nava civakê de dubare car were avakirin.

Ev nêrîn girîng e, lewre zarokan wekhev, xwediyê maf û azadiyan nabîne û wan li hemberî tundkarî, cidaxwazî û binpêkirina mafên din bêparastin dihêle.

# Li Tirkiyeyê rewşa zarokan

“Ez li nûçeyan temaşe nakim. Hemû nûçe derbarê qezayan an jî revandina zarokan de ne. Bandorê li ser psîkolojiya min dike. Ez dixwazim ku bûyerên bi vî awayî kêm bibin. Ez dixwazim di televizyonê de bernameyên weke yên Bariş Mançoyî hebin ku bi zarokan re çêdikir, dixwazim pêşbirkên zanînê yên ji bo me hebin. Wê çi xweş bûya ku bultenên nûçeyan ên ji bo me hebûya. Hemû zarok ne wek hev in. Gelo li dibistanên bajarên din çi dibe, zarokên li wir çi dikin? Em ji van agahdar bibûna… Li dibistanê, mamosteyê me yê dersa tirkî me û nivîskaran dicivîne. Em hevpeyvînan bi wan re çêdikin. Dikarin di rojnameyan de tiştên wiha çêbikin ku xwendina pirtûkan bêhtir teşwîq bikin. Her zarok nivîskarê pirtûka ku xwendiye meraq dike. Di rojnameyan de quncikên ku zarok çêdikin hebûya. An jî çima programeke wiha nîne? Divê zarok bêhtir bikaribin biaxivin, rave bikin. Ez şexsek im. Divê herkes zarokan weke şexs bibînin. Divê rojnameger jî di vê mijarê de malbatan agahdar bikin”.

**Şehri Bekci, Pola 6em**

Tirkiyeyê piştî sala 1990î PMZ ya NYyê îmze kiriye û ji bo maf û azadiyên zarokan gelek xebat meşandiye.

Ji sêyan yekê serjimara Tirkiyeyê zarok in. Lê hê jî li Tirkiyeyê gelek caran mafên zarokan tên binpêkirin.

**Serjimar**



**80.810.525**

**ji 22.883.288ê**

**% 28,3yê wan zarok in**

(TÜİK, Li gorî îstatîstîkan zarok, 2017)

Di pêşdibistan, dibistanên seretayî, yên navendî û lîseyan de nêzîkî rin. **18** milyon zarok tên perwerdekirin.

(MEB, Îstatîstîkên hindekariyê yên salên 2017-2018ê)

Her ji 100 zarokî, 33 zarokên 5 salî ne naçin pêşdibistanan.

(MEB, Îstatîstîkên hindekariyê yên salên 2017-2018ê)

% 83,4 zarokên keç diçin lîseyê. Ev rêje li Anadolûya Başûrê Rojhilat %67,2 yê.

(MEB, Îstatîstîkên hindekariyê yên salên 2017-2018ê)

## Milyon û 47 hezar

û 536 zarokên sûriyeyî di çaxa çûna dibistanê de ne. %62,5ê van zarokan diçin dibistanan. %37,5ê wan nikarin biçin dibistanan.

(MEB, Îstatîstîkên xwendekarên di bin parastina demkî de ne, 2018-2019)

359 hezar û 896 zarokên kêmendam

li dibistanên seretayî û navîn dixwînin. Hejmara zarokên kêmendam ên naçin dibistanan nayê zanîn.

(Hewldana Reforma Perwerdeyê, Rapora Çavdêriya Li Perwerdeyê 2017-2018)

893 hezar zarokên karkeriyê dikin hene ku temenê wan di navbera 6 û 17yan de ye. %44,7ê van zarokan di zeviyan de kar dikin.

Hejmara zarokên sûriyeyî ne di nava vî daneyî de ye. Lewre TÜİKê ji sala 2012ê û vir ve encamên Anketa Zarokên Karkeriyê Dikin nû nekiriye.

(TÜİK, Anketa Zarokên Karker, 2012)

Zêdetirî 7 milyon zarokî malbatên wan xizan in, ev dike her ji sê zarokan yek. %40ê van zarokan pêdiviya proteînê nikarin ji goştê sor, yê mirişkan an jî masiyan bistînin.

(Navenda Lêkolînên Ekonomîk û Civakî ya Zanîngeha Bahçeşehîrê, 2014)



**3013** zarokên girtî û yên cezanexwarî li girtîgehan tên girtin.

(Adalet Wezareta Dadê, daneyên heta Çiriya Paşiyê ya 2018ê )

Sala 2017ê **23.906** zarokên ku temenê wan 16 û 17 bûn, bi darê zorê hatine zewicandin.

(TÜİK, Bi Hejmaran Rewşa Zarokan)

Sala 2017ê **16.348** dozên “îstîsmara zayendî li zarokan” **hatiye vekirin.**

(Wezareta Dadê, Îstatîstîkên Sicîlan ên Edlî)

Li gorî dozên ku di sala 2017ê de hatine vekirin, em fam dikin ku 120 hezar zarokên temenê wan di navbera 12 û 17yan de neçarî sûckirinê hatiye kirin.

(Îstatîstîkên Sicîla Edlî Wezareta Dadê)

Di 6 mehên pêşiyê yên sala 2017 û 2018ê de **21.957** zarok weke ducanî hatine tomarkirin.

(Bersiva ku ji bo serlêdana bidestxistina zanyariyan a Alî Şeker, parlamenterê CHPyê )

Sala 2017ê **117** sûcên nefretdariyê li hemberî **LGBTI+yan çêbûye.**

Mexdûrên 23 bûyeran zarok bûne.

(Rapora Sûcên Nefretdariyê yên Homofobîk û Transfobîk a KAOS GLyê)

# Nûçegihaniya zarokparêz çi ye?

- Zarokan weke kesên xwedî maf û azadî dibîne.
- Cidahiya di navbera zarokan ji bîr nake lê armanc dike ku zarok weke xwe û xwedî şexsiyet bên temsîlkirin.
- Bi wê nêrînê li serpêhatiyên zarokan dinêre ku berpirsiyariyên dewletê yên derbarê mafên zarokan de heye.
- Ji bo balê bikişîne ser maf û azadiyên zarokan nûçeyan çêdike.
- Binpêkirina mafan dişopîne û dihêle ku ev rewş bê dîtin.
- Ji bo pêşîlêgirtina li van binpêkirinan û avakirina polîtîkayan pêşçalak e.
- Dema nûçeyan derbarê binpêkirina mafên zarokan de çêdike, nûçeya xwe bi wî awayî saz dike ku zarok careke din nebin mexdûr.
- Guh dide nêrînên zarokan ên derbarê pirsgirêkên wan û serpêhatiyên li derdora wan de, di nûçeyan de cih dide van tiştan.
- Zarokan dike mijara nûçeyên erênî.
- Di çêkirina her cure nûçeyan de wê pirsê ji xwe dike, gelo wê bandoreke çawa li zarokan bike. Ji bo nûçe di çarçoveya zarokparêziyê de çêbibin behsa nûçegihaniya bibaldir dike.

## Tevna Ragihandinê ya Serbixwe (BIA)/ bianet bi wê zanebûnê tevdigere ku divê astengiyên li pêşiya azadiya xweîfadekirinê û agahdariyê û beşdariya nav jiyana civakî, siyasî û medenî ya zarokan bên rakirin û bi vê ve girêdayî nûçegihaniya mafparêz jêneger dibîne.

## Ji bo mafên zarokan roleke girîng a medyayê heye!

Hêza medyayê heye ku nîşan bide bê civak bi çi çavî li zarokan dinêrin û di heman demê de dikare vê nêrînê ji nû ve ava bike.
Ji ber wê ye ku avakirina helwesta li hemberî zarokan de, bandora wî tiştî heye ku bê zarok çiqasî û çawa di medyayê de tên nîşandan û medya li gorî zarokparêziyê tevdigerin yan na?

### Medyaya Zarokparêz mimkun e?

**Medyaya ku ne alîgirê zarokan be, zarokan weke şexs nebîne, wan weke obje bibîne, rêzê li jiyana wan a taybet negire, zanyariyên wan ên şexsî bi rengekî neberpirsane belav bike, guh nede dengê wan, cidaxwaziyê bike, zarokan weke kesên tenê hewcedariya wan bi parastinê heye û bêhêz nîşan bide, Peymana Mafên Zarokan a NYyê binpê dike ku Tirkiye jî îmze avêtiye binê wê. Lê medyaya zarokparêz mimkun e.**

# Di medyayê de zarok

"Dema dê û bavê min di televizyonê de nûçeyan temaşe dikin, ez jî temaşe dikim. Gelek nûçe nîne ku derbarê zarokan de bin yan jî behsa zarokan dike. Di nûçeyên ku ez dibînim de bivê nevê serpêhatiyek heye. Pêşbirkên ku zarok beşdar dibin di televizyonê de hene. Bi min wisa tê ku ew pêşbirkên zarok beşdar dibin, weke ji bo kêfxweşiya gihiştiyan hatibin amadekirin. Weke mînak, ez gelekî dixwazim derbarê spartekan de nûçe bên çêkirin. Ez dixwazim nêrina xwe jî bînim ziman. Hejmara spartekan zêde ye. Ez dixwazim bibêjim ku zêde guh nadin zarokan".

**Ece Sancılı, Pola 5em**

## Çiqas dibin mijara nûçeyan?

Him li cîhanê him jî li Tirkiyeyê zarok bi qasî mezinan nabin mijara nûçeyan. Heta zarok digel rêjeya serjimara xwe gelekî kêm dibin mijara nûçeyan.

ji bo lêkolîna têkildar bitikine…

## Kengî dibin mijara nûçeyan?

- Piranî dema tiştên "nebaş", "trajîk", "xof" bên serê wan, dema rastî îstîsmarê an jî tecawizê tên,
- Dema tên revandin, kuştin an jî di encama qezayekê de dimirin,
- Dema bi darê zorê sûcek bi wan tê kirin...

**Nûçeyên mînak**

- Li Mêrsînê tirsa mezin! Zarokê pênc salî bi kêran hatiye kuştin
- Bira û xalê zarokê/a 14 salî tecawiz lê kirine
- Gumanbarê ku ji bo diziyê ketiye malê, xwediyê malê kuştiye

## Çawa dibin mijar?

Zarok weke "sûcdar", "kesê/a bixeter", "qurbanî", "mexdûr", "bêçare", û "kesê/a neçalak" dibin mijara nûçeyan. Ji yên magazînê bigirin heta yên siyasetê yên edlî, di hemû nûçeyan de bi qalibên diyar, behsa wan tê kirin.

Ji Fakulteya Ragihandinê ya Zanîngeha Bilgiyê ya Stenbolê dersdêr Prof. Dr. Asli Tûnçê roja 16, 20 û 24ê Nisana 2018ê, di 31 rojnameyên netewî de li 140 nûçeyên derbarê zarokan de nêriye û raporek amade kiriye. Qalibê ku di encama vê lêkolînê de derketine holê wiha ne:

### *Aksesûrên polîtîkayê*

Siyasetmedar li pey "aksesûaran" digerin û zarokan dixin şûna amûran.

Fotograf serlîstikvan e. Hemû pozên ku siyasetmedar di her fersendê de zarokan hembêz dikin, mînakên wî tiştî ne ku siyasetmedar zarokan weke aksesûarên polîtikayê bi kar tînin…

**Mînak**
Akşener li Dîlokê ye…

Weke mînak; dema zarok di rojên mîna 23yê Nîsanê Cejna Serdestiya Netewî û ya Zarokan û Roja Zarokan a Cîhanî de di rojeva hemû çapemeniyê de ne. Li gel vê, weke amûrekê tên dîtin. Heta di 23yê Nîsanê de ji her demê zêdetir dibin amûrên siyasetê.

**Mînak**
Hişt ku tîqetîk bi Serokwezîrî bikeve!

### *Amûra xwînşîrînî yê*

Ne tenê ji bo siyasetmedaran her weha ji bo cîhana çanda popüler jî zarok weke aksesûar û amûra xwînşîrînî yê ne. Medya jî hez jê dike ku navbenykariyê ji vî tiştî re bike. Weke mînak, dema stranbêj Kenan Dogûlûyî di konserta xwe de radihêje pitikekê, medya vê rewşê bi fotografekî mezin û bi nivîsa "Dixwaze bibe bavê pitikê" vê nûçeyê di weşîne.

**Mînak**

Dixwaze bibe bav…

Cem Adrian dixwaze bibe bav

### *Dibin failên dram an jî trajediyê*

Nûçeyên li ser zarokan tên çêkirin bi piranî derbarê kuştin, qeza û tundkariyê de ne. Zarokan dixin nava nûçeyê û hewl didin ku bobelat/karesat bêhtir berbiçav bibe: "Emrê wî têra dîtina cejnê nekir", "Tevlî pitika xwe li ser rêya hesinî mir".

Yan jî merasîma cenazeyên polîs û leşkerên tên kuştin bi wan dîmenan pêşkêş dikin ku tê de zarokên wan ên digirîn hene.

**Mînak**

Kurê berbazê şehît dil şewitand

Ji ber şer reviya lê bû qurbaniya/ê qezayê

### *Dibin mijara pêkenînê*

Car caran jî zarok di nûçeyan de dibin mijara pêkeninê. Nûçeya bi ser navê "Xelîle biçûk êdî naxwire" yek ji mînakan  a vê mijarê ye. Di nûçeyê de nexweşiya zarokê neh salî weke mijara pêkenînê tê pêşkêşkirin. Ji zarokî re dibêjin "sebî". Hevokên weke "Sebiyê ku ji ber êş û azaran ne di ti halî de bû got 'ez dixwazim bimrim' û giriya".

**Mînak**

Biçûkok di beroşê de asê bûye

### *Lehengê serkeftiyên ne ji rêzê*

Gelekî kêm be jî nûçeyên serkeftinê yên derbarê zarokan de tên weşandin. Lê divê ev serkeftin bi piranî "ne ji rêzê" bin. Digel ku ji bo zarokên din weke modelekê tên pêşkêşkirin jî bi piranî ev zarok dikin parçeyek ji zimanê reklaman an jî îronî yê.

**Mînak**

Kurikê li xerîbiyê Xelata Mozartî girtiye û bûye Rûmeta Malatyayê

Jî ye lê pîdeyan dipêje

> "Car caran di televizyonan de dibînim ku zarok nikarin perwerdeyê bibînin. Divê her zarok perwerdeyê bibînin. Zarok jî zindîwer in, divê rêzê ji wan re bigirin. Yên gihîştî weke ku li cîhanê zarok nebin, tevdigerin. Rêz û hurmetê ji fikrên wan re jî nagirin. Weke ku rêzê ji wan re digirin, xwe nîşan didin. Ez ji liv û tevgerên wan fam dikim ku rêzê nagirin. Bi hin tiştên din re mijûl dibin, ne bi me re, guh nadin me. Hin ji wan bala xwe didin fikr û ramanên me. Li gor nêrîna min, ew kesên ku li nava çavên me dinêrin û bala xwe didin me, hurmetê didin fik û ramanên me. Divê diyalog bi me re jî bê danîn. Rojnameger dikarin mafên zarokan binivîsin. Dikarin binivîsin ku em xwedî kîjan mafan in û van di nûçeyan de ragihînin".
>
> **Güneş Salman, Pola 2em**

# Tevlî mînakan, binpêkirinên di medyayê de

## Zimanê Nûçeyan

Zimanê ku di nûçeyan de tê bikaranîn divê zarokan wekû mexdûr, lawaz, bêhêz, bêparêz û kesên nelirêzê nîşan nede û rê li ber tûndkarî û îstîsmaran nedevekirin.

***Qurbanîkirin û Mexdûrîkirin***

Ji ber ku zarok di nûçeyan de bi piranî wekû qurbanî an jî mexdûr tên pêşkeş kirin, ziman û sernivîsa nûçeye jî li gor wê  pêşkeşkirinê tê amade kirin. Wekû “**Ax Melisa, Wax Ayşe”, “Dawiya diltezîn ya zaroka biçûk”**

***Biçûkxistin-Henekpêkirin***

Zimanê  nûçeyan bûyeran dramatîze dikin, zarokan biçûkdixin û henekên xwe bi wan dikin. Wekî mînak,  nûçeya bi navê **“Zaroka biçûk a netebitî di qûşxanê de asê maye”** di 31ê Çiriya Pêşiyê ya 2018an de di gelek televîzyon û malperan de hatiye weşandin. Di vê nûçeya têkildarî bi rewşa zaroka 2 saliya ku gelek tirsiyaye û dibe ku brîndar jî biba de hema bêje tinaz bi zarokê hatiye kirin.

Di nûçeyê de hatiye nivîsîn “zaroka ku navê wî/wê nehatiye diyarkirin, ketiye qûşxanê û têde rûniştiye”, “komên tenduristiye piştî  hewldana 5 xulekan ew zarok ji qûşxaneyê derxistiye”  li gel van gotinan dîmenê zarokê jî bikaranîne.

Gotinên ku derbarê zarokan di nûçeyan de tê bikaranîn divê nehêle zarok di bin tohmetê de bîmîne û  di aliyê derûnî û fîzîkî de zerarê bibîne. Her weha  rê nedin cûdakarî li wan bên kirin.

***Navlêreşkirin – înfaza bê dad û pirs - cûdakarî***

Di nûçeyan de zimanê ku ji bo zarokan xirab bide nîşandan tê bikaranîn. Gotinên wekû  “zarokê/a kolanan”, “tînerkêş”,  “dizê kolanan”, “zarokê/a sûcdar” mînakên vê rastiyê ye.

Wek di ya gihiştiyan de beriya ku dadgeh biryarêke bide nabe zarokan wekî “sûcdar”, “diz” û  “kujer”

**Li gor Qanûna Cezayan ya Tirkan, zarokên ku salên wan di bin 12an de ye kiryarên  wan ne “sûc”e.**

binirxînin. Ev binpêkirina “pîvana bêtohmetiyê” ye û li dijî nerîna dadî ya taybete ji bo zarokan e.

Di nûçeyan de ji bo zarokan çendîn gotinên wekî  “serkeftî”, “ciwan”, “jîr” û “netebitî”  tê bikaranîn. Di nav  gotinan de her çiqas gotinên erênî hebe jî lê bikaranîna gotinên bi vî awayî  ji bo zarokan baş nîne, cûdakariyê  di nav wan de çêdike. Cûdaxwaziya di zimanê nûçeyan de herweha di pêşkeşkirina nûçeyan de jî tê dîtin. Wekî mînak; zarokeka malbateke dewlemend dema ne qanûniyê dike wek bûyereke takekesî û neasayî tê pêşkeşkirin. Lê belê zarok dema hejar û xizan be wek “sûcdar”, “diz” û “kujer” tê penasekirin.

✔

**Divê derbarê binpêkirinên mafên zarokan de xwedî zanyarî bin. Ger bûyereke wesfa nûçeyê tê de hebe divê ev nûçe li gor nêrin û berjewendiyên zarokan jî bê nirxandin. Ger bûyer binpêkirina mafekî be divê bi zelalî were aşkerekirin.**

### *Rewakirin û lirêzêdîtina binpêkirinan*

Hin mijarên derbarê binpêkirinan de yên wekî zewicandina zarokan bi darê zorê dema dibin nûçe, zimanekî wisa tê bikaranîn ku pinpêkirinê asayî û rewa dike. Wekû mînak; zewaca zarokan bi gotinên wekû “evîndar bûye”, “dil ketiye”û “reviye” tê rewakirin û bi vî awayî berpirsiyariya zewacê jî dixe stuyê zarokan. yan jî dibêjin “bi xwestina malbatê hatiye zewicandin” û bi rêya nûçeyan zewicandina zarokan têne rewakirin.

Di cihê peyvên “zext” an jî “zorê”de bikaranîna gotina “razîbûn”ê him rê li ber vepirsandina gihîştiyan digire him jî ew nêrîna ku dibêje mafê malbatê li ser zarokan heye asayi dike.

**Ji bîr neke ku mafên malbatê li ser zarokan nîne, tenê berpirsiyariya wan li ser heye.**

✔

**Divê baldarî li ser wî tiştî hebe ku zimanê di nûçeyan ên di bûyerên zarokan de tê bikaranîn dê çawa bandorê li ser jîyana wî çêbike. Divê nehêle ew ziman bibe sedema şikestin û biçûkxistina wî.**

### *Bikaranîna gotinên/servîsên ku dibe sedema çêbûna travmayê di zarokan de*

Ziman an jî servîsa ku di nûçeyan de tên bikaranîn wê bandorê li ser jiyana giştî ya zarokan çêbike. Di nûçeyan de pirê caran gotinên ku di zarokan de dibe sedema çêbûna travmayê û hesta sucdariyê tê bi karanîn. Servîsên ku zarokan ji aliyê hest û fîzîkî dişkênîne tên nivîsandin. Zarok kengî van servîsan bibîne wê travmaya wî xwe nû bike.

**“Ji ber ku nikarîbû ji kurê xwe re pantor bikire xwe kuştiye ...”**

Ev servîs yek ji wan servîsan e ku di zarokan de dibe sedema çêbûna travmayê. Ev bûyer di 21ê îlona 2018an de çêbûye. Malpereke nûçeyan ya înternetê ev bûyer bi servîsa “Ji ber ku nikarîbû ji kurê xwe re pantor bikire xwe kuştiye” belav kirîbû. Herweha nûçe bibû sedema gengeşiyên mezin. Li piştî xwekuştina bavê zarokê/î saziyên fermî daxuyanî dane û gotine; sedema xwekuştinê ne ew e ku nekaribûye ji kurê xwe re pantor bikire, sedem ew e ku pirsgirêkên derûnî yê bavê zarokê/î hebûye. Pişt re rojnameger hatiye desteserkirin û piştî demekê serbest hatiye berdan. Ji aliyên ku beşdarî nîqaşê dibin çi kesî ji çavên zarokê/î li bûyer nenirxandiye.

Ma nedibû di dema çêkirina nûçeyê de hebûna zarokî/ê jî di berçav de derbas bikirana? Wê hestên zaroka/ê ku bavê wê/wî bi vî şêwazî miriye çawa bin gelo? Ma servîsa nûçeyê nabe sedem ku zarokî/ê xwe sûcdar hest bike ? Pêşkêşkirina mirineke bi vî şêwazî, bandoreke mezin wê li ser jiyana zarokî/ê ku di qonaxa kamiliyê de ye çêbike. Dibe ku bibe sedema travmayeke heta hetayî.

Beriya nûçe bê amadekirin divê li ser van tiştan bi sekinin.

| Çewt | Rast |
|---|---|
| Zarokê kolanan | Zarokên li kolanan dijî / zarokên li kolanan dixebitin |
| Zaroka/ê sûcdar | Zarokê/a neqanûniyê dike |
| Zarokê mêr | Zarokê kur |
| Zaroka bûk | Zewaca zarokan/ Zewaca di temenê zarokatiyê de |
| Zaroka/ê ku dixebite | Zaroka/ê ku tê xebitandin |
| Zaroka/ê bêkes | Zaroka/ê di bin parastina dewletê de |
| Dê û bavbûna zarokên ne heq | Dê û bavbûna zarokan |
| Zirkeç/zirkur(zaroka/ê ne heq) | Zaroka/ê ku kesan bi awayekî fermî xwe jê re kirine dê û bav |
| Zaroka/ê wargehê | Zaroka/ê di bin parastina dewletê de |
| Zaroka/ê hêlînê | Zaroka/ê di saziyê de mezin dibe |
| Zaroka/ê hewcedarê parastinê | Zaroka/ê pêdiviya wî/ê bi parastinê heye |
| Dê û bavê rast | Dê û bavê bîyolojîk |
| Wargeha parastina zarokan | Navendên xweyîtiya zarokan |
| Zaroka/ê Mexdûr | Zaroka/ê rastî mexdûriyê hatiye |

### *Çêkirina Têgehên Çewt*

Medya têgehên çewt yên wekû “zarokên kolanan”, “zarokên ku kevira davêjin” bikartîne. Dema derbarê rewşa jiyana zarokan de zanyarî nehê dayîn, nûçe dibe sedema têgihîştineke çewt û rê li ber sedema têgihîştina rast digre.

## Bikaranîna dîmenan

Bikaranîna dîmen û wêneyan di nûçeyan de her wekû zimanê nûçeyan gelek caran mafên zarokan binpêdike.

***Bikaranîna wêneyên ku dikare bibe sedema aşkerekirina nasnameya zaroka/ê rastî binpêkirinan hatiye***

Di nûçeyê de navên zarokên ku rastî îstîsmara zayendî hatine û navên zarokên ku kiryarê îstîsmara zayendî ne û navên zarokên ku tên darizandin û yên hatine girtîn nayên bikaranîn, lê bi bikaranîna dîmen û wêneyan, nasnameya zarok û xizmên wî aşkere dikin. Bikaranîna dîmen û wêneyên bi vî şêwazî şaşî ye.

**Di nûçeyê de dibe ku nav hatibe guhertin, hatibe veşartin û heta nehatibe bikaranîn jî lê dîsa jî dîmenên ku nasnameya bira û xizman aşkere dike û wan dike bin xeteriyê divê neyê bikaranîn.**

**Wêneyên ku di nûçeyê de tên bikaranîn dibe ku bibe sedema têgihîştinên şaş û neyênî, divê liv ê baldar bin. Dibe ku zarokî/ê “sûcekî mezin û xeternak” kiribe jî, divê hilbijartina dîmenan li ser vê bingehê were kirin; ew sûc encama barûdoxeke ye û ew zaroke, mafên wî/ê hatiye binpêkirin. Herweha dîmenên ku di nûçeyan de tê bikaranîn divê di dîmenê de wateyek yan nîşaneyek ji bo biçûkxistina zarokan tê de nebe.**

***Bikaranîna dîmenên ku ji bo sûcdarkirinê û biçûkxistinê***

Zimanê ku di nûçeyan de zarokan weku "sûcdar" dide ravekirin bi wêneyan jî vê sûcdariyê dixemilînin.

Wekû mînak ; di 6ê Çiriya Pêşiyê ya 2018an de hatiye îdia kirin ku zaroka/ê temenê 13 sali ye, ji ber ku bavê wî /wê tûndkari li dayîka wî/wê kiriye, bavê xwe kuştiye. Herweha di hin rojnameyan de zarokê 13 salî wek "kujer" hatiye binavkirin û wêneyê wî/ê ya ku di destî de tîr û sîleh heye weşandine.

Di hinek nûçeyan de jî wêne û dîmenên ku zarokan biçûk dixin tên weşandin. Carnan di nûçeyan de wêneyê zarokan bi xwe neyê bikaranîn jî dîmenên ku derbarê naveroka nûçeyê de tê bikaranîn zarokan biçûk dixin.

## Dîmenên ku nasnameyê aşkere dike wê kengî bê bikaranîn?

**Ev pirs bûye gotûbêjkirina rojnamegeran jî ku dibêje di nûçeyan de di kîjan rewşê de dikarin wêne û dîmenên zarokan bi kar bîne û bi kar nehîne. Rewşên wisa heye ku weşandina dîmenan di berjewendiyê zarokan de ye. Wekû mînak; dibe ku zarok bixwaze xwe îfade bike û balê bikşîne ser nêrînên xwe. Dikare bi biryara xwe bibe perçeyeke ji tekoşîna domdar ya mafî. Di van rewşan de jî ji bo bikaranîna dîmenên zarokan divê destûr ji wan were stendin. Ji bo vê jî mînaka herî baş Greta Thunberg e. Greta Thunberg, xelkê Swêdê ye, aktîvîst û temenê wê 16 ye. Ji bo ku balê bikşîne ser guherîna îklîmê ketiye greva dibistanê. Ji bo bikaranîna dîmenên Gretayê êdî pêwîstî bi destûrê nemaye.**



# Peşniyarên ku di amadekirina nûçeyan de

"Ez di televîzyonê de nûçeyan temaşe nakim. Lê dema ez diçim salonê, ger li wir bê temaşekirin, ez dibihîsim. Ez bêtir dixwazim nûçe bila derbarê mafên zarokan, mafên mirovan, ders û sîstema perwerdeyê de bin. Ez di van nûçayen de dixwazim guh bidim zarokan û li nêrînên wan temaşe bikim. Ez bêtir medyaya civakî bi kar tînim. Di Youtube û Instagramê de dijûn û tiştên zayendî hene. Tiştên ku ji bo zarokan ne guncane hene. Li şîroveyên ku di bin hin vîdeoyan de hatiye kirin de henekên xwe bi zarokan dikin. Rêzê ji zarokan re nagrin."

**Efe Sulanç, Pola 7em**

### Di dema çêkirina nûçeyan de li van tiştan baldar bin

## Divê ji bîr neke ku di parastina mafên zarokan û pêkhatina mafên wan de roleke girîng a medyayê heye.

Li gor xala 17em a PMZyê ya NYyê, "Mafê her zarokî heye bo zanyariyan werbigire û agahdar bibe/bike" û li gor xala 13em jî "mafê her zarokî heye ku bi şêwazekî azad bîr û ramanên xwe derbibire." Herweha pêkneanîna van mafan, cûdaxwazî û binpêkirina mafên zarokan e.

### Di nûçeyê de cih bide nêrînên zarokan jî!

Binpêkirinên mafên zarokan, ewlehiya wan, perwerde, tenduristî û rewşa wan a civakî divê bibin mijara nûçeyan û di nava civakê de nîqaş li ser wan çêbibin. Dema ev dibin mijara nûçeyan, girîng e ku serî li nêrîna zarokan bidin.

- Di dema çêkirina nûçeyan de zarokan weke amûreke nûçeyê û temaşevanê neçalak nebînin.

**Mînak; dema we li ser sîstema perwerdeyê nûçeyek çêkir, guh bidin zarokan. Nêrînên gelekî girîng ên zarokan ên derbarê sîstema perwerdeyê û pirsgirêkên wan de hene. Ji ber wê, di nûçeyên xwe de cih bidin nêrînên wan.**

- Fersenda axavtinê bidin zarokan ku li ser pirsgirêkên welêt jî biaxivin.
- Nêrîna zarokan weke amûra “xwînşîrînî” û “pêkenînê” nîşan nedin û bi awayekî cidî guh bidin nêrînên wan.

### “Bi çavê zarokan nûçeyê binivîsin”

- Dema we nûçeyek derbarê zarokan de çêkir, bila berjewendiyên zarokan di pêşiya xalên din de be.

**Mînak; rojên borî nûçeyek li ser zarokekî hatibû çêkirin ku dema li kolanê dilîze serê wî dikeve nava hesinên pencereyê. Dema nûçeya wî tê çêkirin, wêneyek pê re tê weşandin ku wêne zarokî/ê biçûk dixe. Her weha behsa rizgarkirina zarokî/ê ya ji hêla îtfaiyeyê hatiye kirin. Dibe ev nûçe bi wî awayî bihata weşandin ku behsa ewlehiya parkên zarakan û qadên lîstina zarokan ên li bajêr bikira û bipirsiya ku ev qad û park têrê dikin an na.**

- Di nûçeyê de ne tenê bibêjin “qeza ye” û bi vî awayî bûyerê penase bikin, her weha gelek mafên zarokan ên weke perwerde, tenduristî û ewlehiyê bi bîr bixin û lê bipirsin ka kêmasî hene yan na.
- Li ser wî tiştî bifikirin ku pêkanîn û polîtîkayên tên meşandin bandoreke çawa li ser zarokan dikin.

### Ne li ya rotîn lê li aliyên cida binêrin

Nûçeyê bi gotinên rûtîn ên gelekî tên bi kar anîn saz nekin. Bi çavekî din bûyerê binirxînin û bi vê dibe ku hûn bihêlin baldarî derbarê zarokan de çêbibe.

**Mînak; dema herkes li ser destpêkirina sala nû ya perwerdeyê nûçeya çêdike hûn dikarin li ser wan zarokan (kêmendam, karker, penaber...) nûçeyekê çêbikin ku ji mafên xwe yên bingehîn bêpar in û nikarin biçin dibistanan.**

**Mînak; di mijara dersdêrên nehatine tayînkirin û yên bi peyman de ne tenê ji aliyê dersdêran li mijarê binêrin. Her weha hûn dikarin nûçeyê bi wî awayî çêbikin ku bê ev rewş bandoreke çawa li zarokan dike.**

### Ne tenê bûyerê her weha sedeman jî binivîsin

- Hûn rastiyê weke ku bûye ragihînin, ev têra xwe bibandor e. Dema ku we nûçeyeyek li ser xizanî û tunebûnê ya derbarê zarokan de çêkir, bi zimanekî dilşewat nenivîsin. Pirsgirêka ku zarok pêrgî wê hatibin çi dibe bila bibe metnê xwe li ser esasên mafparêziyê binivîsin.
- Şert û mercên ku zarok tê de ne, ne tenê serpêhatiyan ragihinin. Derbarê pêvajoya sedemên van tiştan de jî zanyariyan biweşînin.
- Lê bipirsin ka di pêvajoya mijarê de binpêkirin hene yan na, berpirsiyariya kesî/an heye yan na, çi hatiye kirin an nehatiye kirin? Di çarçoveya berpirsiyariya dewletan a derbarê mafên zarokan de li bersivên van pirsan bigerin.

**Mînak; rojnameyekê bi ser navê “lîstika sanal bi vî awayî bi dawî bûye” nûçeyek belav kiriye. Di vê nûçeyê de behsa wan zarokan tê kirin ku du zarok di bin bandora lîstika ku li ser komputerê lîstine de mane û li ser înternetê çek kirî ne. Paşê jî mirine. Nûçeyeke bi vî awayî ne tenê weke bûyereke edlî biweşînin. Dibe zanyariyên derbarê bandora hin lîstik û bikaranina teknolojiyê ya li ser zarokan jî di vê nûçeyê de bên weşandin. Yan jî di nûçeyê de li ser kirîn û firotina çekan a li ser înternetê bisekinin. Behsa valahiya yasayan bikin û heke ku hebe behsa daxwazên rêxistinên sivîl ên di vî warî de kar dikin bikin.**

### Kêmî xwe nebînin

- Dema ku we behsa serkeftinên zarokan kir û nêrînên wan belav kir, bi wî awayî behsa wan nekin ku weke tiştekî neasayî kiribe.
- Zarokan kêmî xwe nebînin, gotinên ku bibe sedema xwe weke yên din bibîne, nenivîsin. Weke "Serkeftina Mahîrê Şivan", "Serkeftina mezin a zarokê kêmendam".
- Nûçeyên serkeftinê bi wî awayî binivîsin ku ji bo zarokên din bibe mînak û wan teşwîq bike.
- Xebatên zarokan ên li ser muzîk, wêne, spor û yên din derxin pêş û wan teşwîq bikin.
- Li ser wî tiştî baş bifikirin ku gelo di nûçeyan de hewce dike behsa etnîsîte, ol, bawerî, nasnameya zayendî an jî nîjada zarokan bê kirin an na.

**Mînak; Heke ku zarokekî/ê ji ber nasnameya xwe ya zayendî li dibistanekê rastî zordariyê hatibe û xwe kuştibe, dikarin di nûçeyê de behsa van bikin. Lê dema serkeftina xwendekarekî ku di ezmûneke navnetewî de bi dest xistibe hûn bikin nûçe û tê de behsa nasnameya wî ya zayendî bikin, ev dibe sedema ji nû ve avakirina cidaxwaziyê.**

- Ji bîr nekin ku mafê zarokan heye komeleyan ava bikin, bi rengekî aştiyane kom bibin.

**Mînak; çalakiyên zarokan ên derbarê pirsgirêkên li dibistanan, yên derbarê sîstema perwerdeyê û derbarê jîngehê de bi weşînin û bihêlin ku belav bibin.**

## Li ser encamên nûçeyan bifikirin

- Li ser wî tiştî bifikirin ku dema nûçe hat weşandin, gelo ihtimal heye ku ewlehiya can an jî giyanî ya zarokî/ê bikeve bin xetereyê.
- Li ser wî tiştî bifikirin ku gelo nûçe dibe bibe sedema navpêxistina zarokan, rastî cidaxwazeyê werin û bên vederkirin.
- Zimanekî wiha nepejirînin ku bibe sedema kêmxistin û tohmetkirina zarokan.





### Zanyariyên derbarê nasnameya wan de veşêrin

- Di nûçeyê de navê zarokên ku rastî îstîsmara zayendî hatine yan jî bûne failên van bûyeran, nexweşiya HIVê pê re hene, ji ber tohmetekê hatibe dadkirin û ceza xwaribe nenivîsin an jî veşêrin. Dîmen û wêneyên wan bi awayekî vekirî belav nekin.
- Cih nedin zanyariyên wisa ku derbarê nasname, navnîşan, malbat, dibistana ku zarok diçe de bin, hay ji vê mijarê hebin.

### Bi zimanekî pornografîk nenivîsin

- Dema ku we nûçeyek li ser zarokekî/ê rastî tundkariyê hatî kire nûçe, bi zimanekî wisa nenivisin ku pornografîk be, behsa detayên tundkariya wî/ê dikin be.

**Mînak; Di nûçeyên tundkariya cinsî de gotinên weke "firkan" "hembêz kir", "cihên taybet" yên bêqiymet dikin nenivîsin.**

- Zarokan mexdûr nîşan nedin û li ser benpêkirinan û berpirsan bisekinin. Tekez cih bidin peymanên navnetewî û berpirsiyariyên dezgehan.
- Bi rêya îstatîstîkan mezinahiya pirsgirêkê nîşan bidin. Pirsan derbarê biryarên ku di dozên îstîsmara zayendî de tên dayîn re bikin, bi nêrinên pisporan heke ku hebe kêmasiyan, daxwazan bînin ziman.

### Nehêlin ku binpêkirin asayî bên dîtin

- Dema we li ser zewaca bi darê zorê çêkir, weke bûyereke takekes nîşan nedin. Cih bidin wan daneyan ku bila behsa berbelaviya pirsgirêkê de bin. Gotinên weke "dayika biçûk" bi kar nînin ku dihêle rewş asayî bê dîtin.

### Bêyi ku zarokan bixin bin xetereyê piştrastiyê bikin

- Heke hûn nizanibin bê zarokê ku hûnê bikin mijara nûçeyê di bin xetereyê de ye yan na, mijar çiqas ji bo nûçeyê guncav be jî çênekin.
- Piştrastkirina zanyariyên derbarê zarokan de bêyi ku wan bixe bin xetereyê bikin.
- Dema ku hûn bixwazin zarokên dê û bavên wan sûcek kiribin an jî liv û tevgerên xirab nîşan didin, weke mînak zarokên neçar in bi dê û bavê alkolîk an jî neçarî kuryetiya tiryakê tên hiştin re dimînin, bikin mijara nûçeyê li ser baş bifikirin. Divê ewlehiya zarokî

an jî zarokê di pêşiya her tiştî de be. Dibe ku dema hûn bûyerê bikin nûce, bandoreke neyênî li ser zarokî yan jî zarokê çêbike.

### Ji bo kişandina wêneyan destûrê bixwazin

- Ji bo ku nûçeya we zêdetir bê xwendin an jî balê bikişîne, dîmenên zarokan di çarçoveyeke zayendîtî de nîşan didin bi kar neynin.

**Mînak; "Di nûçeyên istismara zayendî de dîmenên metaforik ên dihêle kedxwariya hîsî çêbibin bi kar neynin; pêlîstoka şikestî (wesayit an jî bebika paçikî), reşeyên zarokan, fotografên zarokên şerm dikin an jî digirîn, ên zarokên hêrsbûyî, ên zarokên ku îşareta bisekine çêkiriye, ên zarokên xemlandî, ên zarokên desthinekirî..."**

**Li şûna van dîmenan fotograf an jî dîmenên çalakiyên rêxistênin civaka sivîl en di vî warî de kar dikin bi weşînin.**

- Ji bo kişandina fotografên zarokan rêbazên adil, aşkere û durist tercîh bikin. Heta ji destê we hat, destûrê ji zarokan an jî ji kesên berpirsiyariya wan hilgirtine bistînin.
- Wan dîmenan ne weşînin ku wê zarokan biçûk bixin, neçar nîşan bidin an jî navpêxistinê ji bo wan çêbikin.

**Mînak; dema hûn behsa pirsgirêkeke zarokek kêmendam dikin dîmenên ku wî "aciz" an jî "mihtac" nîşan didin, nekişînin.**

**Dîmenên wiha tercîh bikin ku bila bê zanîn ku potansiyela zarokên kêmendam jî heye. Yan jî di dîmenan de bidin zanîn ku daxwazên wan jî hene.**

### Lêkolînê li ser çavkaniyên nûçeyan bikin

- Lêkolînê li ser sicîla hemû kes û saziyên ku li ser navê zarokan diaxivin an jî dibêjin em berjewendiyên wan diparêzin bikin. Li xebatên wan ên berê kirine binêrin. Pê bawer bibin ku derbarê mijarê de çiqas pispor in.
- Tenê serî li wan kesan nedin ku gelek caran di medyayê de derdikevin û herkes dikarin xwe bigihîne wan.
- Têkiliyê li gel saziyên civaka medenî û mafparêz dînin û xwe bigihînin pisporan.





"Bi piranî ez bi rêya înternetê nûçeyan dixwînim. Bi piranî ez nûçeyên li ser sporê dixwînim. Ez her weha nûçeyên li ser istismara zarokan dixwînim. Li gorî nêrîna min di nûçeyan de zarok di asta du heta ya sêyê de ne. Ciwan dikarin di gelek mijaran de hin tiştan bibêjin. Zarok û ciwan hene ku dikarin gelek tiştên serkeftî bikin. Li gorî nêrîna min divê ev tişt bêhtir bibin mijara nûçeyan. Weke mînak, zarok derbarê huner, şano û sînemayê de çi dibêjin? Ez dixwazim di nûçeyeke wiha de nêrîna xwe bînim ziman. Ez dixwazim derbarê sîstema perwerdeyê de nêrînên xwe bînim ziman. Em salê du caran li dibistanê kovarekê amede dikin. Xwezî ne tene li vê dibistanê ev tişt bihata kirin".

**Mirza Ekinci, Pola 9em**

## Pêşniyazên pratîk ji bo qad û komên zarokan ên cûda

### Perwerde

- Lê bikolin ka pergala perwerdeyê ji bo zarokan wekheviya fersendê çêdike yan na.

**Wekû mînak; di hejmara keçikên ku diçin dibistana amadehiyê de, di navbera herêman de ferqên pir mezin hene. Li hin bajarên rojhilat hejmara keçikên ku diçin pêşdibistanan, nîvê hejmara keçikên li rojava ye. Têkildarî keçikên ku zû dev ji perwerdeya mecbûrî berda ne û sedemên vê yekê, nûçeyan çêkin.**

- Lê bipirsin ka xwendekar di nav pergala perwerdeyê de çiqas xwedî gotin in. Bala xwe bidinê ka derbarê dibistan, ezmûn û mufredatê de guh didin nêrînên wan û encamên vê yekê bikin nûçe.
- Kampanya, rapor û xebatên saziyên sivîl ên têkildarî perwerdeyê ji nêz ve bişopînin.

- Pirsgirêkên di pergala perwerdeyê de bandoreke çawa li jiyana zarokan dikin; vê yekê bi çîrokên  zarokan re vebêjin.
- Lê bipirsin ka zarokek derveyî rewşa xwe ya civakî-aborî, dema ku biçe dibistanekê perwerdeyeke baş dibîne yan na.
- Lê bikolin ka dibistan xwedî şert û mercên wekhev in an na.

**Wekû mînak; li dibistanan bigerin û dibistanên dewletê yên li taxên xizan û dibistanên dewletê yên li taxên ku kesên ji aliyê civakî-aborî ve rewşa wan çêtir, ferq û cudahiyên di navbera wan de çavdêrî bikin. Bi mamoste û xwendekaran re biaxivin û newekheviyê bikin nûçe.**

- Lêkolînên navneteweyî yên rewşa perwerdeyê ya Tirkiyeyê û ya welatên OECDyê bidin ber hev, bişopînin.
- Li sedemên bêberdewamî û terikandina dibistanê bikolin. Dema ku hûn vê yekê dikin nûçe, bi tenê hevdîtinan bi pisporan re çênekin. Teqez sedemên vê yekê ji zarokên ku dev ji dibistanê berdane yan jî berdewamê lê nakin, bipirsin.
- Lê bikolin ka wekî zordariya hemsalan û zordariya sîber, li dibistanan tiştên çawa çêdibin. dersdêr, rêveberên dibistanan û Wezareta Perwerdeyê ya Neteweyî têkildarî van pirsgirêkan çi dikin, lê bipirsin. Nûçeyên ku dê rê nîşanî perwerdekaran û dê û bavan bidin, amade bikin. Nêrînên zarokan hildin.
- Kêmahî, zarokên kêmendam, koçber û zarokên romanan di perwerdeyê de rastî pirsgirêkên çawa tên? Pergala perwerdeyê cudahiyan çiqas digire nav xwe? Derbarê van mijaran de bi dersdêr û zarokan re hevdîtinan çêkin û mijarê berfireh bikin.
- Dorhêlên dibistanan, pirtûk û materyalên dersan, rolên zayenda civakî çawa nîşan didin, derbarê vê de lêkolînan bikin.
- Pirtûk û materyalên dersan ên ku gotin û şêwazên zayendperest dihewînin, bikin nûçe. Newekheviyan aşkera bikin.
- Lê bikolin bê ka dersdêr têkildarî zayendên civakî xwedî fikrên hişk in an na.



## Tenduristî

- Lê bikolin ka hemû zarok ji mafê tenduristiyê bi awayekî wekhev sûdewar dibin an na.
- Lê bikolin ka dorhêlên ku zarok lê dijîn, hîn dibin û dilîzin çiqas paqij in.
- Xizmeta tenduristiya zarokan çawa tê birêvebirin? Di nexweşxaneyên taybet û yên dewletê de pirsgirêk hene? Ev hemû, bandoreke çawa li zarokan dikin? Lêkolîna van bikin, li nexweşxaneyan bigerin.
- Bi bijîşk, nexweş û xizmên nexweşan re û her wiha saziyên sivîl û sendîkayên di vî warî de lêkolînan dikin re hevdîtinan bikin.
- Lêkolîn û daneyên têkildarî tenduristiyê bişopînin.
- Mirina zarokan li gorî salan çawa diguhere, vê yekê lêkolîn bikin. Sedemên mirina zarokan û xebatên di vî warî de, her wiha kêmasiyan bikin nûçe.
- Lê bikolin bê ka nexweşxaneyên ku tê de kêmasiya bijîşkên pispor heye, hene yan na.
- Nexweşxane çi qas li gorî hewcedariyên zarokan in, lê bipirsin.
- Nûçeyên wê çêkin ka têkildarî zarok û dê û bavan derbarê nexweşiyên mîna diyabet, obezîte, bikaranîna madeyên hişbir û perwerdeya zayendî de xebatên çawa hatine kirin.
- Bi zimanekî ku tirs û xofê di nava xwendevanan belav bike û bihêle ku mijarê gelemperî fam bikin nenivîsin.
- Têkiliyê di navbera hin pirsgirêkên kesane û civakî û xizmetên tenduristiyê yên parêzkar û bergir de çêbikin û van têkiliyan bikin nûçe.

## Cudakarî

- Bihêlin ku cudakariyên li dijî zarokan bikevin rojevê. Ferq û cudahiyên di navcbera zarokên keç/kur, xizan/dewlemend, bajarî/gundî de derxin holê. Lê bipirsin bê ka dikarin bi awayekî wekhev xwe bigihînin mafên we.
- Ji bîr nekin ku di navbera 0-18 saliyê de ku bi hiqûq û peymanan zarokatî hatiye diyarkirin û hewcedarî, tecrube, zexmbûn û mafên zarokên di serdemên bebikî, zarokatiya pêşîn û adolesan de, ji hev cuda ne.
- Wekî perwerdenebûna bi zimanê dayikê, zarokên ku rastî her cure cudakariya hatine, bihêlin bila tiştên hatine serê wan vebêjin. Dema ku hûn vê yekê dikin nûçe,

bila ji we re tiştê girîng ew be ku zarok zirarê nebînin.

- Di van nûçeyan de xwe ji giştîkirinê dûr bigirin. Li ser hûrgilî û agahiyên misoger kûr bibin. Heke derbarê mijarê de lêkolîn an jî dane hebin, teqez bi kar bînin.
- Dewlet li hember cudakariyê çi cure polîtîka û bernameyan pêk tîne, lê bikolin. Li hember cudakariyê cih bidin peymanên navnetweyî jî. Lê binêrin bê ka ew peyman tên bicihanîn an na.
- Nemaze rastiya daxuyaniyên ku komên nîjadperest û nîjadperwer didin, lêkolîn bikin. Hewl bidin nûçeya xwe li gorî heqaniyetê saz bikin.

## Karkeriya zarokan

- Li gorî Zagona Kar a di meriyetê de, xebitandina zarokên kêmî 15 saliyê qedexe ye. Zarokên di navbera 15-18 saliyê de jî, heke dê li ber perwerdeya wan nebe asteng, tenduristî û ewlehiya wan têra xwe were parastin, dikarin bixebitin. Lê belê di serî de çandinî, zarok di gelek waran de bi awayekî derzagonî tên xebitandin. Lê bikolin bê ka zagon çima nakevin meriyetê û kêmasiyên zagonan çi ne.
- Her çend bi awayekî zagonî zarokên ji 15 saliyê mezintir dikarin bên xebitandin jî, ji bîr nekin ku karkeriya zarokan binpêkirina mafan e. Nûçeyên xwe li gorî vê ferasetê amade bikin.
- Zarokên bi darê zorê tên xebitandin, gelek ji wan dev ji perwerdeya xwe berdidin an jî bi awayekî bi rêk û pêk dewam nakin. Nikarin xwe têr bikin. Balê bikişînin ser van mafên bingehîn û wan bikin nûçe. Daxwaz û pêşniyazên saziyên civaka sivîl ên di vî warî  de kar dikin, ragihînin.
- Tecrube û fikrên zarokên ku tên xebitandin li nûçeyên xwe zêde bikin. Bi wan hevdîtinan pirsgirêkan bi awayekî şênber vebêjin. Her wiha nûçeyên xwe bi daneyên têkildar piştrast bikin.
- Dane û agahiyên têkildarî qeza û cinayetên kar ên zarokên ku tên xebitandin, bi rêk û pêk bişopînin.
- Şîrketên ku zarokan dixebitînin, bikin nûçe û wan derxin pêş çavan.
- Şaziyên civaka sivîl, akademîsyen, pispor û sendîkayên têkildarî zarok û karkeriya zarokan dixebitin, wek çavkaniyên nûçeyên xwe bi kar bînin.
- Têkiliya xizaniyê ku sedemeke sereke ya karkeriya zarokan e, bi rewşên ekonomîk girêbidin û bikin nûçe.

## Şer û pevçûn

- Lê bikolin ka li herêmekê dema pevçûnên çekdarî çêdibin çi bandorên demkurt û demdirêj li ser zarokan pêk tînin.
- Lêkolînê li ser kiryar û polîtîkayên hikumetê yên di vî warî de bikin.
- Lê bikolin bê ka hêzên ewlehiyê pê dizanin dê çawa nêzî zarokan bibin û di vî warî de agahiya wan heye yan na. Heke binpêkirinên wan hebin, berçav bikin.
- Zarok wek leşker tên bikaranîn an na, lê bikolin û mîkrofonê dirêjî zarokan jî bikin.
- Lê bikolin ka zarok dikarin xwe bigihînin alîkariyên mirovî yan jî di vî warî de tên astengkirin û rastî binpêkirinên wekî kuştin, revandin û zexta zayendî tên an an. Heke hebin, wan bikin nûçe.

## Zayend, nasnameya zayendî, meyldariya zayendî

- Zayendîtî ne bi tenê têkildarî zêdebûn û erotîzmê ye. Zayendîtî, nasnameya zayendî û meyldariya zayendî jî digire nav xwe.
- Ji bîr nekin ku mafên zarokan ên îfadekirina zayendîtî û perwerdeya zayendî jî heye, her wekî mafê wan parastina ji mêtingeriya zayendî heye.
- Lê binêrin ka hûn nûçeyên xwe bi feraseta heteronormatîf çêdikin an na. Ji bîr nekin ku hemû zarok heteroseksuel nîn in.
- Lê bikolin ka zarok ji ber meyldariya zayendî, nasnameya zayendî û îfadekirina wê di nav civak, malbat û dibistanê de rastî kîjan pirsgirêkan tên.
- Zarokên ku rastî cudakarî, wederkirin, şîdet û zordestiya hemsalên xwe tên, binpêkirinên mafên wan berçav bikin. Dema ku hûn vê yekê  dikin jî, nehêlin bi tu awayî zarok zirarê bibînin.
- Bi zarokên LGBTÎ+ re hevdîtinan çêkin û pirsgirêkên wan bikin nûçe. Lê belê dema ku hûn vê dikin, cudakariyê ji nû ve neafirînin. Wan nekin armanc.

- Civatên LGBTÎ+ ên ku ji hêla zarokan ve hatine sazkirin, lêkolîn bikin. Daxwaz û pirsgirêkên wan bikin nûçe.
- Lê bipirsin ka perwerdekar têra xwe xwedî agahî û tecrube ne û dema zarok di dibistanan de rastî cudakarî û şîdetê tên, perwerdekar çi dikin ku carinan hinek rewş dibin sedem ku zarok dev ji perwerdeyê berdin.
- Lê bikolin ka serwîsên rêberiyê yên di dibistanan de têkildarî mijarê xebatên çawa dikin.
- Naveroka perwerdeya zayendî ya li dibistanan lêkolîn bikin. Zayendîtî bes bi penetrasyonê sînordar tê girtin? Der barê tenduristiya zêdebûn û zayendî de têra xwe agahî tên dayîn? Rêzdarî ji bo meyldariya zayendî û nasnameya zayendî heye? Ew perwerde, meyldariya zayendî û nasnameya zayendî dihundirînin? Van mijaran lêkolîn bikin.
- Lê bikolin bê ka malbat û perwerdekar zarokên ku "ne li gorî normên zayendî yên civakî ne" wek "anormal" dibînin an na. Bandora dîtina "anormal" a li ser zarokan lêkolîn bikin. Bi mezinan re li ser zarokatiya wan hevdîtinan çêkin.
- Cih bidin nêrînên akademîsyen û saziyên civaka sivîl ên di vî warî de xebitîne.

## Koçber û penaber

- Ji bîr nekin, li cihê ku zarokên koçber çûne zarok xwedî çi maf û azadiyê bin, zarokên koçber jî xwedî hemû maf û azadiyan e, dewlet divê ji bo zarokên koçber ên di nav sînorên xwe de van maf û azadiyan dabîn bikin. Di nûçeyên xwe de bi vê ferasetê tev bigerin.
- Heke bi taybetî hewce nabe ku behsa statuya hiqûqî (satuya parastinê ya demkî, hwd.) ya dewlet didin kesên ji ber sedemên wekî şer koçber bûne, bê kirin, termînolojiya mafên mirovan ji xwe re bikin bingeh û ji bîr nekin ew "zarokên koçber" in û nûçeyên xwe bi vî awayî çêkin.
- Têkildarî şert û mercên zarokên koçber û ka dikarin xwe bigihînin maf û azadiyên wekî perwerde û tenduristiyê bikin nûçe.
- Lê bikolin ka zarokên koçber diçin kîjan dibistanan, di dibistanan de bi pirsgirêkên wekî ziman û wederkirinê re rû bi rû dibin an na.
- Der barê zarokên koçber de dewlet polîtîkayên çawa dimeşîne? Encamên erênî û neyînî yên van polîtîkayan lêkolîn bikin û bi pispor û rêxistinên saziyên sivîl bişêwirin.
- Dengê zarokên koçber bidin bihîstin.
- Çîrokên derbarê pevrejiyanê de û yên di vî warî de cesaretê bidin civakê, bikin nûçe.

## Zarokên bi hewcedariyên taybet

- Li bendê nemînin ji bo ku hûn zarokên bi hewcedariyên taybet bikin nûçe, tiştekî xirab bê serê wan an jî di warekî de serkeftinekê bi dest bixin.
- Rewşa zagonî û civakî ya zarokên bi hewcedariyên taybet û kêmendam lêkolîn bikin. Astengiyên ku nahêlin bibin xwedî şert û mercên wekhev ên jiyanî lêkolîn bikin.
- Lêkolînên derbarê pirsgirêkên wan de bişopînin.
- Heke zarok perwerdeyê nabînin an jî nikarin xwe bigihînin perwerdeyê, sedemên van pirsgirêkan bikin nûçe.
- Lê bipirsin bê ka malbat têra xwe destek, alîkarî û agahiyê werdigirin an na.
- Ji ber ku li gorî zarokan şert û mercên fizîkî nayên dabînkirin, rastî cudakariyê tên. Kêmasiyên di vî warî de lêkolîn bikin û bikin nûçe.
- Di hemû nûçeyên xwe de cih bidin nêrîn û tecrubeyên zarokan. Pirsgirêk an jî serkeftinên wan di ser çîrokên wan re vebêjin.

---

**Wekû mînak; şahidiyê li rojeke zarokekî/e li ser kursiya kêndaman bikin. Li parkên zarokan ên bajar û mekanên çand û hunerê bigerin. Van deran bikin nûçe ka li gorî kêmendaman hatine sazkirin an na. Pirsgirêka xwegihandinê di ser rewşa wan re bi awayekî şênber vebêjin.**

---

- Ji gotinên wekî "neçarî kursiya kêmendaman e", "neçarî nav nivînan e" xwe dûr bigirin ku wan wek kêmasî û bêçare nîşan didin û ji hêla dîtbarî ve nîşan nedin. Ev yek bi tenê li hemberî wan hesta dilpêşewitînê çêdike û nahêle potansiyela wan a heyî were dîtin.
- Dema ku çîroka serkeftinê dikin nûçe, gotinên wekî "Tevî kêmendamiya xwe bi ser ket" bi kar neynin. Gotinên wiha

dihêlin ku serkeftinên zarokên kêmendam bi awayekî awarte bên dîtin.

- Dema ku zarok an jî ciwanên kêmendam di warekî de serkeftî bûn, şaş nebin. Pêşdaraziya ku nikarin serkeftî bibin, xurt nekin. Berovajî wê, bila nûçeyên we vê pêşdaraziyê ji holê rakin.
- Pevrejiyan û wekheviyê bikin bingeha nûçeyên xwe.

## Zarokên ji hêla dewletê ve tên parastin

- Zarokên ji hêla dewletê ve tên parastin di kîjan saziyan de dimînin û cureyên wan saziyan hîn bibin. Ka ew sazî ewle ne û xizmeta wan têrê dike yan na, lêkolîn bikin.
- Ew sazî li ber şopandina serbixwe tên vekirin an na, heke tên vekirin raporên wan ên hatine amadekirin, bişopînin.
- Binpêkirinên mafan ên di nav saziyan de, di çarçoveya feydeya zarokan de bikin nûçe.
- Lê bikolin ka zarok û ciwanên ji hêla dewletê ve tên parastin, di jiyana xwe ya dibistan û kar de rastî kîjan pirsgirêkan tên û têra xwe alîkariyê hildidin an na.
- Cudakariyên li wan tên kirin, bikin nûçe. Zarokên ji hêla dewletê ve tên parastin, pê re roportajan çêkin. Bihêlin bila ew bi xwe pirsgirêkên xwe vebêjin. Lê belê dema ku hûn nûçeya xwe çêdikin, nehêlin ew werin demxekirin. Nûçeyên xwe wisa saz bikin ku pêşdaraziyên civakê ji holê rake.
- Lê bikolin bê ka ewladkirin û pergala malbata parêzvan çawa dixebite.
- Ciwanên ku piştî temenekî ji wargehan vediqetin, balê bikêşin ser pirsgirêkên wan ên starbûn û karpeydakirinê.

## Zarokên ku sûc pê didin kirin

- Zagonên ku zarok û ciwanan diparêzin, lêkolîn bikin. Kêmasiyên di zagon û pratîkê de bikin nûçe.
- Lê bipirsin bê ka zarokên mexdûr an kirdeyên sûc, çawa tên fehmkirin û nîşandan.
- Îstatistîkên fermî û lêkolînên li ser vê mijarê hatine kirin, bişopînin.
- Pê bizanin ku heke zarokek bi zagonan re dikeve nav nakokiyê, ev encamek e û piştî ku ew zarok rastî gelek binpêkirinên mafan hatiye, paşê li hemberî zagonan tev geriyaye.
- Zagon û sepanên ku dema zarok bi zagonan re ketin nava dubendiyê, lêkolîn bikin.
- Mekanîzma û rêbazên pergala edaletê ya xweserî zarokan hîn bibin û bipejirînin. Pergal û mekanîzmayên heyî bi van re hevrû bikin.
- Lê bipirsin bê ka dema ku zarokên bi zagonan re ketine nava nakokiyê yan jî mexdûrên sûc dema ku îfadeya wan tê hildan, bergiriyên ku psîkolojiya wan biparêzin, tên girtin an na.
- Hejmar û şert û mercên zarokên di zindanan de lêkolîn bikin. Venêrîna serbixwe li ser van saziyan dikare bê kirin, lêkolîn bikin. Heke tê kirin, raporan berbelav bikin.
- Pergala edaletê dihêle zarok ji nû ve tev li nava civakê bibe? An jî pergaleke di çarçoveya cezakirinê de tê birêvebirin? Di nûçeya xwe de bersivên van pirsan bidin.
- Şopandina fikrî ya nûçeyên sûcdarkirin û destgîrkirina zarokan teqez bikin. Binpêkirinên mafan ên di van pêvajoyan de pêk tên, berçav bikin.

## Mexdûrên şîdeta zayendî

- Zagonên şîdeta zayendî yên ku zarokan digirin nava xwe, bikin nûçe. Lê bipirsin bê ka têrê dikin an na. Di pratîzekirina wan de pirsgirêk çêdibin an na, lêkolîn bikin.
- Daneyên têkildarî mijarê bişopînin. Guherînên çawa çêbûne û sedemên wan guherînan lêkolîn bikin.
- Zêdebûna dozên şîdeta zayendî bişopînin, sedemên wê bikin nûçe.
- Şopandina fikrî ya dozan bikin, encamên wan bikin nûçe.
- Ji bo ku zarokên rastî şîdeta zayendî hatine hay jê çêbe û dûre rê û rêbazeke çawa were bikaranîn, ji bo nîşandana wê cih bidin nêrînên pisporan.
- Hem li gorî mezinan hem jî li gorî zarokan mekanîzmayên serlêdanê hene, tune ne? Lê bipirsin bê ka serlêdan û gazinên têkildar bi awayekî ewle tên kirin an na.
- Lê bipirsin ka polês, pisporên xizmetguzariya civakî, dersdêr û kadroyên tenduristiyê di vê mijarê de perwerde bûne an na.

- Ji bo zarokan xizmetên veşartîbûnê, parastin, destek û şêwirmendiyê çawa pêk tên û têrê dikin an na, lêkolîn bikin.
- Nûçeyên ji bo parastina zarokan ji pornografiya xetên telefon û înternetê û pornografiyê çêkin.
- Di vê mijarê de bi saziyên civaka sivîl û parêzeran re bikevin nava têkiliyê.
- We zarokên rastî mêtingerî û îstîsmarê hatine, wek qurbanî yan sûcdar nîşan da, yan jî wek mirovên xwedî maf û rûmet nîşan da? Mimkun bû ku hûn cih jê re veqetînin da ku zarok xwe îfade bikin an jî guncaw bû? Îhtîmal heye ku zimanê nûçeyê yan jî fotograf, nasnameya zarokan derxe holê? Dîtbariyên ku we bi kar anîne, gelo dê bibin sedem ku zarok careke din rastî şîdetê werin? Beriya ku hûn nûçeyên xwe biweşînin, van pirsan ji xwe bikin.





# Ji bo nûçeyan, divê hevdîtineke çawa bi zarokan re bê kirin?

"Gelek caran, her wekî kesên mezin dema ku li ser navê me biryaran didin, di nûçeyan de jî nêrînên me nayên pirsîn. Heke nûçeyên ku girîngiyê didin fikr û ramanên zarokan çêkin, dê çêtir be. Heke mirov nûçeyên wiha bibînin, belkî di jiyana xwe de jî heman tiştî bikin û fikra zarokan jî bipirsin. Divê pirsgirêkên li dibistanê, kêmasiyên perwerdeyê ji zarokan bipirsin, ji ber ku kesên bi pirsgirêkê re rû bi rû bûne, dikarin pirsgirêkê vebêjin. Di parkên kêfxweşiyê yên li navendên kirîn û firotinan de, dema ku tiştekî nebaş li zarokan dikin, dibe nûçe lê bi zarokan re naaxivin. Heta ku li ser her mijarê bi tenê welî biaxivin, zarok jî nikarin bibin şexs. Bi tenê dê bibin kopiya weliyan. Heta di rêzefîlman de jî ji zarokan re dibêjin "Ma tu çi jê fêm dikî?". Bi ser de jî wekî ku ev yek komîk be, henekan jî dikin. Ez di înternetê de li nûçeyan dinêrim, dema ku tiştekî nexweş tê serê zarokan, her kes şîn girê dide, dibêjin "em bi te re ne" filan bêvan. Lê belê ew pirsgirêk çareser nabe. Mesela min dixwest ez di televîzyonê de li bernameyekê temaşe bikim ku tê de jiyana zarokên li dibistanên gundan û yên li dibistanên taybet jî, jiyana hemû zarokan dide ber hev. Heke şansê min hebûya ku min jî nêrînên xwe bigotana, min dixwest têkildarî giraniya dersan û ne li dibistanê ne jî di tevahiya pergalê de derbarê nehildana nêrînên me de biaxivim."

**Sude Kardaş, pola 9em**

Ji bo hevdîtina bi zarokan re hestiyarî û berpisyariyeke zêde hewce dike.

- Xwe bidin nasîn û hûn ê nûçeyeke çawa amade bikin, vebêjin.
- Jê re bibêjin ka hûn çima dixwazin guh bidin nêrînên wî/ê.
- Ji bo hevdîtinê ji zarok û dê û bavên wan destûrê hildin.
- Pê bawer bin ku zarok û dê û bavên wan dizanin ku bi rojnamegerekê/î re hevdîtinê dikin.
- Derbarê cihê weşandina nûçeyê de agahiyê bidin.
- Heke berjewendiya raya giştî hebe yan jî di çarçoveya xweîfadekirina zarokan de be, dikare bêyî destûra dû û bavan biryara çêkirina nûçeyê bidin.
- Dema ku hûn ji bo hevdîtinê zarokan hildibijêrin, ji ber şarezahiyên fizîkî yan jî perwerde, statu, ol, zimanê dayikê, temen, nîjad, nasnameya zayendî û zayendê cudakariyê nekin.

## Bêyî ku zext hebe, bila baweriya we bi gotinên we hebe

- Ji bo hevdîtinê cihekî bêdeng û zarok bikare xwe lê rehet hîs bike, peyda bikin.
- Hejmara nûçegihan û wênekêşan sînordar bikin.
- Hûn dikarin bihêlin ku zarok cihê hevdîtinê hilbijêre.
- Beriya hevdîtinê bi zarok re biaxivin, pê re bilîzin û bihêlin bi amûrên qeydê, wênegir an jî kamerayê bilîze.
- Pê bawer bin ku zarok rehet e û çîroka xwe bêyî zext li ser hebe, vedibêje.

**Wekû mînak; heke hûn pirsgirêkeke zarokan a di dibistanê de jê dipirsin, dibe ku newêre vê li cem dersdêr yan jî rêveberên dibistanê vebêje. Yan jî zarokên ku ji neçarî dixebitin dê li cem kardar newêrin şert û mercên xwe yên xebitînê vebêjin.**

- Peywendeke li gorî mijara ku çîrok an jî dîmenên zarok tê de ye, pêşkêş bikin.
- Biryarê bidin bê ka dê jiyan û çîroka zarok bi paşxaneyeke çawa were dayîn. Divê hûn pê ewle bin ku dema mal û civata ku tê de dijî yan jî bi giştî li ku derê ye, derkeve holê, ji bo zarok nebe sedema xetereyê.

## Xwe li ser serê wan mezin nekin

- Ji zarokan nexwazin ku çîrokeke ku ne têkildarî xwe vebêjin an jî tiştekî bikin.
- Dema ku zarok diaxivin, xwe li ser serê wan mezin nekin. Pê nehesînin ku hûn jê zêdetir tiştan dizanin.
- Heke hewcedariya we bi wergêrekî/ê hebe, yekî ku baş ji zarokan fêm dike û armanca hevdîtinê dizane, tercîh bikin.
- Ji wergêr bixwazin ku her tiştî wergerînin. Jê re bibêjin bila kurteya gotinan nebêjin.
- Heke hûn pir baş nîşeyan nagirin, teqez amûrên qeydê bi kar bînin. Heke na, dibe ku reseniya zimanê zarok an jî îfadeya wan xira bibe.

## Ji pirsa hêsan dest pê bikin

- Di serî de pirsên wekî nav, temen û cihê lê dijî yên hêsan bipirsin.
- Dema hûn xîtabê lê dikin, her tim navê wan bibêjin.
- Heta ji destê we tê ji bo hilbijartin û bersivandina zarokan derfetan çêkin.
- Dema hevdîtinê kurt bigirin, dema hewce bû navberê bidinê.
- Pirsên servekirî jê bipirsin. Pirsên sergirtî ku dikarin bersivên “Erê” yan “Na” bidinê, nepirsin.

**Wekû mînak; dema hûn bi zarokekî ku kar pê tê kirin re diaxivin, li şûna pirsa “Tu di kar de diwestî?” pirsên wekî “Tu kîjan karan dikî, piştî kar tu çawa hîs dikî?” bipirsin.**

- Heta ku hûn agahiyên dixwazin hildidin, pirsan bi çend şiklên cuda bipirsin û li gorî wê amadehiya xwe bikin.
- Ji bo ku li ser pirsan bifikirin, wan teşwîq bikin.
- Dema hûn negihîştin encama armanckirî û we hevdîtin bi dawî kir, nehêlin bibe sedem ku zarok xwe ne serkeftî hîs bikin.

## Hevdîtina li gel zarokên ku rastî travmayê hatine

- Dema ku hûn mijarên hesas bipirsin, lê hişyar bin ku pirsên we zarokan neêşînin.
- Dema ku hûn li ser îstîsmar, pirsgirêkên xwarinî ango xidayî û zordestiyê diaxivin, derbarê çawaniya hevdîtinê û kêmkirina derdê zarokan de serî li pisporan bidin.
- Li gorî rewşa ku hatiye serê wan, carinan dê û bav an jî xizm an jî dersdêrên wan li cem bin, wê ev pêbaweriyê bide zarokan. Li vê yekê hişyar bin.
- Bila haya we jê hebe ka ji çi nerehet dibin û mijarên hesas zêde tev nedin.
- Heke xemgîn bibin, amade bin ku hevdîtinê xilas bikin an derbasî mijareke din bibin.
- Hevdîtinê li cihê ku trawma lê çêbûye, pêk neynin.
- Heke hewce bike nasname û dîmenên zarokî\ê werin veşartin, jê re bibêjin ku dê navê wan neyê bikaraînîn. Bila bawer bike ku hûn ê dîmenên wan bi kar neynin. Heke hewce bike fotograf û dîmenên we kişandine, nîşanî wan bidin. Dilê wan rihet bikin ku rûyê wan xuya nake.
- Zarokên ku rastî trawmayê hatine, dema ku yên biyanî pê re eleqedar dibin, dibe ku bikevin nav bendewariyên cuda. Li gorî vê yekê tev bigerin.
- Tu carî bertîlê nedin zarokan û wan nexapînin.
- Hûn çi qas bixwazin sempatî û bîrbiriyê nîşan bidin jî, sozên derew nedinê.
- Piştî ku medya eleqeya xwe xilas dike jî zarok di nav rewşa krîzê de dimînin. Ji ber vê yekê jî sozên ku neyên bicihanîn, dibe ku bibin sedem ku zarok baweriya xwe ya bi mezinan winda bikin.
- Heke hûn dixwazin jê re bibin alîkar, vê yekê bi rêya saziyeke pêbawer bikin.
- Bêyî qebûlkirina wan, aşkerakirina agahiyên şexsî yên zarokan ji aliyên derve re, teklîfên bi vî awayî bi rêveberên saziya xwe û parêzeran bişêwirin.



## Gotinên zarokan piştrast bikin

- Girîng e ku mirov mafê axaftinê bide zarok û ciwanan. Lê belê ji bîr nekin ku dibe ku zarok ew bersiv dane ku fikiriye dê bên qebûlkirin.
- Gotinên zarokan bi gotinên hin zarokên din an jî gotinên mezinan piştrast bikin.

## Dema ku hûn hevdîtinê xilas dikin, van bipirsin

- Dema ku hûn hevdîtinê bi dawî dikin, jê bipirsin bê ka zarok an jî dê û bav dixwazin tiştekî bipirsin yan na.
- Jê bipirsin ka tiştên ku naxwazin werin nivîsandin hene yan na, dixwazin navên xwe yan jî detayeke din biguherînin an na.
- Dîsa jê re bibêjin bê ka nûçe dê li ku derê were weşandin û ji bo hûn jê re bişînin, amadehiyê bikin.

**Beriya weşandina nûçeyê ji xwe bipirsin!**

**Piştî ku nûçe were weşandin, ji bo parastina zarokan bergirî hatine girtin?**

**Heke hinek zarokên din jî bi we re bikevin nav têkiliyê, mekanîzmayên destekê hatine amadekirin?**

# Nûçeyên mînak

"Mirovên kamil guh nadin fikrên zarokan. Heke derfet hebe di televizyon û rojnameyan de fikra xwe bibêjim min ê bigota ji bo lîstikan gelek kêm wext heye, spartek zêde ne. Nûçegihan dikarin nûçeyan çêbikin û diyar bikin wextê me yê ji bo lîstinê namîne û cihê lîstinê nîne."

**Ezel Ece Er, Pola 5em**

## Nûçeyek û du şêweyên nûçenivîsînê

Di vê beşê de hûn ê nimûneyeka nûçeyeka rojnameyekê weşandî bibînin. Herweha hûn ê bibînin bi perspektîfa nûçegihaniya zarokparêz çawa tê nivîsîn.

## Esadî seqet kir, Tirkiye lê bû xwedî

***Pêyên protez bi Hasanê ku bi bombebarana Esadî bavê wî miriye û pê û tiliya wî jê bûye ve hatiye kirin.***

Sûriyeyîyên ku ji şerê navxweyî reviyane û li Tirkiyeyê bûne penaber hewil didin êşên xwe yên giran ji bîr bikin û dest bi jiyaneka nû bikin. Hasan S. yek ji wan kesan e ku hewil dide dest ji jiyanê bernede û li Stenbolê bijî. Pê û tiliyeka wî nemaye. Hasan dê li Tirkiyeyê bigihe tiliyeka protez û pêyê protez.

***3 emeliyat lê hat kirin***

Bavê Hasan S.yî, Mahmut El Ahmet şofêrek bûye ku ji bo veguhestina petrolê kar dikir. Dema şerî dest pê kirî wî dest ji şoferîyê berdaye. Wî li El Babê dikaneka firotina fêkî û sewzeyan vekiriye. Hasanî alîkariya wî dikir. 30ê Adara 2015ê bombeyeka varîlî li dikana wan ketiye. Hasan S. bi birînên giran birîndar bû. Bavê wî, mamê wî û sê pismamên wî mirin. Dayika wî Rüveyda S. (40) Hasan jî tê de bi 8 keç û kurên xwe li Tirkiyeyê bûne penaber. Sê emeliyat li Hasanê pêyê wî jê bûyî hat kirin. Protez bi pêyê wî ve hat kirin. Tiliya beranekê ya Hasanî jê bûye, nikare destê xwe bilivîne. Lê xwe bi jiyanê ve şidandiye. Ji atolyeya pêlavçêkirinê ya lê dişixule her hefte 300 TLyan qezenc dike.

***"Hezar carî şîkîrdarê Erdoganî ye"***

Hasanê li Kuçukçekmeceyê dijî SABAH kir mêvana xwe. Wî got: Esadî, xeyalên min, hêviyên min û siberoja min ji min dizî. Ez hezar carî şikirdarê Tirkiye û serokkomar, R. Tayyîp Erdoganî me ku cih daye min, dayika min û birayên me yên ji Sûriyeyê.Em li vê derê li ewlehiyê ne. Gotinên hasanî ev in:

- (Dema me jê re got çima tu heta xwarê hatî pêşiya me em ê bihatiyan jorê ) Bin şükran size ve ülkenize. Sizi kapıda karşılamak istedim. Tirkiye li me bû xwedî. Ev pêyê protez ê hûn dibînin Tirkiyeyê bi min ve kiriye. Min xwest li ber derî bim û bêm pêşwaziya we.
- (Çima te sê gore kiriye pêyê xwe yê protez, ma te sar e?)
Keko da delinga pantorê min nehêje û ez li hevhatî bixweyîm werdigirim.

***Rojê 12 sietan dixebite***

- "Dema ez gelek li ser pêyan dimînim diwestim. Ez bi servîsê diçim kargehê. Kesên li wê derê bila mala wan ava be alîkariya me dikin. Ez rojê 12 sietan dixebitim û alîkariya malbata xwe dikim. Pereyê ez û birayên min ên dî distînin têra me dike. Em sax in, nefesê didin û distînin. Ez dixwazim jiyana xwe ya mayî li Tirkiyeyê biborînim."

***"Derya ji bo min rehabîlîtasyon e"***

HASAN: "Ez dema avê dibînim nikarim xwe bigirim. Dema em li Sûriyeyê bûn min xwe diavêt çemî, min xwe diavêt birkê. Li Tirkiyeyê min qet dest ji deryayê berneda.Denizde kendimi rehabilite Şemî û Yekşemê carinan ez bi hevalên xwe re diçim bazarê. Lê hefteya borî hinekan telefona min dizî. Ez hêvî dikim li min vegerînin. "

**Nûçeya zarokekê 15 salî yê ji şerê navxweyî yê Sûriyeyê reviyayî û hatî Tirkiyeyê piraniya caran wek mijareka wijdanî dibe nûçe. Tiştên tirajîk yên li ser rewşa zarokî tê berçavkirin. Navê zarokî vekirî tê nivîsîn û paşnav bi herfeka mezin tê nîşandan. Lê ji ber wêneyê hatî nivîsîn nasnameya zarokî bi zelalî tê zanîn.**

**Bi wêneyan tê nişandan ku li Tirkiyeyê pêyekê protez ji bo zarokî hatiye dayin. Heta ku pêyê wî yê protez ji cihê wî hatiye derxistin û li rexa zarokî hatiye danîn û bi vî awayî wêneyê wî hatiye weşandin. Nûçe li ser spasdariya zarokî û "merdînîya" Tirkiyeyê hatiye avakirin. Hingê hîyerarşiya "wan kesên alîkarî dayîn" jî tê parastin. Di sernivîsê de jî zarok wek xemla siyasete hatiye bi kar anîn.**

## Nûçeyek bi nêrîna nûçegihaniya zarokparêz çawa dikare bê nivîsîn?

### Ew zarokên ku nikarin biçin dibistanan dibin karker/ Li şûna dibistanan li atolyeyan in.

***H.S. zarokekê 15 salî ye, ew yek ji 466 hezar zarokên ji Sûriyeyê ye ku nikarin perwerdeya xwe bidomînin. H.S. li atolyeya pêlavan rojê 12 sietan dixebite.***

Li Tirkiyeyê milyonek û 47 hezar û 536 zarokên ji Sûriyeyê hene ku di emrê çûna dibistanan de ne. Ji van zarokan 580 hezar û 877 kes, yanî ji sedî 55ê zarokan di distanan de hatine qeydkirin. Ji sedî 45ê zarokên di dema xwendinê de naçin dibistanan. Yek ji wan zarokan H.S.yê 15 salî ye. H.S. yek ji wan zarokên Sûriyeyî ye ku mecbûr e kar bike. Rojê 12 sietan li atolyayeka pêlavan kar dike.

Bavê H.S.yî, M.S. şofêrek bûye ku petrol vediguhest. Dema şerî dest pê kirî wî dest ji karê xwe berdaye. Wî cihekê firotina fêkî û sewzeyan li El Babê vekiriye. H.S.yî jî li kargeha bavê xwe alîkariya wî kiriye. 30ê Adara 2015ê bombeyeka varîlê li kargeha wan ketiye. H.S. birîndar bûye. Birînên wî giran bûne. Bav, mam û sê pismamên wî mirine. H.S. digel dayika xwe û heft xuşk û birayên xwe hatiye Tirkiyeyê. Pêyekê wî û tiliya wî ya beranekê ya destê wî jê bûne. Li Tirkiyeyê sê caran hatiye emeliyatkirin. Pêyê protez bi wî ve hatiye dayin.

H.S. naçe dibistanê. Ew li atolyeyeka pêlavan kar dike. H.S. gotiye ew rojê 12 sietan dixebite û heftane 300 Lîreyên Tirkan qezenc dike:

“Dema ku ez zêde li ser pêyan dimînim diwestim. Ez bi servîsê diçim kargehê. Li wê derê jî mala wan ava hin kes hene ku alîkariya min dikin. Ez rojê 12 sietan dixebitim û bi vî awayî alîkariya malbata xwe dikim. Ez digel bira, xuşk û dayika xwe dijîm. Heta dayika me bi me re ye ketin ji me re me nîne. Şikir ji Xwedê re. Em sax in û nefesê distînin. Hin bira, xuşk û mezinên me hene ku rewşa wan ji ya min xerabtir e. Bi tenê yek daxwaziya min heye, ez dixwazim pîşeyeka min hebe û li Tirkiyeyê bimînim. Ez dixwazim emrê xwe yê mayî li Tirkiyeyê biborînim.”

**Zarokên diçin lîseyan kêmtir in**

Hewildana Reforma Perwerdeyê raporeka bi navê “bi perwerdeyeka berfireh avakirina jiyana bi hev re û paşerojê” amade kiriye. Li gor raporê milyonek û 47 hezar û 536 zarokên ji Sûriyeyê hene. Ji sedî 55ê wan perwerde dibin. Wezareta Perwerdeya Neteweyî(MEB) ji sala 2011ê ve ji bo entegrekirina zarokên Sûriyeyî polîtîkayên xwe bi awayekê sîstematîk diguhere. Jimara zarokên diçin dibistanan zêde bûye. Lê hê jî ji sedî 45ê zarokên di emrê çûna dibistanan de naçin dibistanan. Li gor raporê ji sedî 33yê zarokên di emrê çûna pêşdibistanan de diçin wan dibistanan, ji sedî 97ê zarokan diçin dibistana destpêkê, ji sedî 58 diçin dibistana navîn, ji sedî 26ê zarokan diçin lîseyan. Li gor raporê ji ber hin sebebên wek zewaca di emrê zarokatiyê de û karkirina di emrê zarokatiyê de zarok nikarin biçin dibistanan.

**“Piştgiriya li bajarên mezin têrê nake”**

Li gor raporê ji bo alîkariya maddî ya penaberan Tevna Ewlehiya Civakî ya Rewşên Hewarê heye, divê piştgiriya maddî bê zêdekirin ku malbat bikarin zarokên xwe rêkin dibistanan. Herweha ji bilî Wezareta Malbat û Polîtîkayên Civakî, MEB û UNICEFê bernameyeka alîkariya girêdayî hin şertan hatiye pêk anîn. Li gor şertan zarokên keçên diçin dibistana destpêkê mehane 40, zarokên kur 35 lîreyan distînin. Keçên diçin lîseyan mehane 60, kur 50 TLyan distînin. Rapor pêşniyar dike ku bila piştgirî ji bo çûn û hatina dibistanê jî bê dayin.

# Çavkaniyên nûçeyan, belge, rêxistin, sazî

## Saziyên civakî

- Wezareta Perwerdeya Neteweyî (MEB) www.meb.gov.tr
- Wezareta Xizmetên Civakî û Malbatan www.aile.gov.tr www.csgb.gov.tr
- Wezareta Werzîş û Ciwanan http://www.gsb.gov.tr
- Saziya Statîstîkan a Tirkan (TÜİK) http://www.tuik.gov.tr
- Midûrîya Giştî ya Xizmetên Zarokan https://cocukhizmetleri.aile.gov.tr
- Saziya Kontrolkarên Civakê www.ombudsman.gov.tr
- Malpera Zarokan a Saziya Kontrolkarên Civakê www.kdkcocuk.gov.tr
- Wezareta Dadê www.adalet.gov.tr
- TBMM(Parlamentoya Tirkiyeyê) Perwerdeya Neteweyî, Komîsyona Çand, Werzîş û Ciwaniyê https://komisyon.tbmm.gov.tr
- Dibistanên Dewletê û dibistanên taybet
- Lijneya Zarokan ya Yekîtîya Baroyên Tirkiyeyê http://cocukhaklari.barobirlik.org.tr/

## Saziyên civakî, rêxistinên parastina mafan û zanîngeh

- Navenda Lêkolîn û Lêceribandinê ya Çanda Zarokan a Zanîngeha Enqereyê www.cokaum.ankara.edu.tr
- Hewildana ji bo Referandûma Perwerdeyê (ERG) www.egitimreformugirisimi.org
- Weqfa Perwerdeya Dayik û Zarokan www.acev.org
- Komîsyonên zarokan yên baroyan
- Komeleya Sivîlên Di Sîstema Ceza Standinê– http://www.tcps.org.tr
- Komeleya Têkoşîna Li Dijî Tûndkariya Zayendî http://cinselsiddetlemucadele.org
- Komeyeya Piştgiriya Jiyana Hevdem (ÇYDD) www.cydd.org.tr
- Weqfa Zarokan www.cocukvakfı.org.tr
- Tevna Têkoşîna Li Dijî Mêtingeriya Cinsî û Ticarî Ya Li Zarokan ( ÇTSC) www.ctcs-genclik.net
- Tevna Hevpar ya Astengkirina

Çavkaniyên nûçeyan: Zarok bi xwe, dersdarên wan, birêvebirên dibistanan, malbatên zarokan, akademîsyen û rojnameger.

Tûndkariya Li Zarokanı www.cocugasiddetionluyoruz.net
- Tevna Parêzerên Li Ser Mijara Zarokan Dixebitin (ÇAÇAV) www.cacav.net/tr/
- Bajarvaniya Zarokparêz (Zaroknavend)
- Zarok û Bajar https://medium.com/kent-ve-%C3%A7ocuk
- Navenda Lêkolîn û Parastina Zarokan ya Zanîngeha Gazîyê http://cocukkoruma.gazi.edu.tr
- Weqfa Jiyana Ciwanan www.genchayat.org
- Weqfa Koç û Alîkariya Mirovî http://www.giyav.org
- Komeleya Piştgiriya Jiyanê www.hayatadestek.org
- Komeleya Jiyan Li Nik Te Ye www.hayatsende.org
- Komeleya Mafên Mirovan www.ihd.org.tr
- Beşa Xebatên Zarokan ya Zanîngeha Bîlgîyê (ÇOÇA) http://cocuk.bilgi.edu.tr/
- Navenda Xebat û Lêceribîna Koçê ya Zanîngeha Bîlgîyê https://goc.bilgi.edu.tr/tr/
- Merkezi Navenda Civaknasî û Xebatên Perwerdekirinê ya Zanîngeha Bîlgîyê (SEÇBİR) www.secbir.org
- Atolyeya Bipêşketinê www.ka.org.tr
- Komeleya Kaos GLyê http://www.kaosgldernegi.org/anasayfa.php
- Komeleya Malbatên Starlêker û Dîtina Zarokan https://www.korev.org.tr
- Tevna Guherîna Dibistanên Gundan www.kodegisim.org
- Weqfa Nesînê www.nesinvakfı.org
- Komeleya Pisporên Xizmetên Civakî http://www.shudernegi.org
- Komeleya Dildarên Sulukuleyê – http://www.sulukulegonulluleri.org
- Komeleya Piştgiriya Civaka Tarlabaşiyê http://www.tarlabasi.org
- Komeleya Li Dijî Tundkariyê û Hişyarkirina Civakê – DUYDER https://duyder.wordpress.com
- Weqfa Azadiya Jinûve Ji Bo Zarokan www.tcyov.org
- Weqfa Dildarên Perwerdeyê ya Tirkiyeyê (TEGV) www.tegv.org
- Weqfa Perwerdeyê ya Tirkan(TEV) www.tev.org.tr
- Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê https://tihv.org.tr
- Komeleya Psîkîyatrîyê ya Tirkiyeyê http://www.psikiyatri.org.tr
- Komeleya Psîkologên Tirk – http://www.psikolog.org.tr
- Navenda Zarokan a Navneteweyî www.icc.org.tr
- Komeleya Yuvayê(Hêlîn) www.yuva.org.tr

## Saziyên navneteweyî

- Navenda Lêkolînên Li Ser Zarok, Ciwan û Medyayê http://www.childrenyout-handmediacentre.co.uk
- ChildHope www.childhope.org.uk
- ChildWatch International www.childwatch.uio.no
- Fona Alîkariya Ji Bo Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî (UNICEF) www.unicef.org.tr
- Navenda Lêkolîna Mafên Zarokan ya UNICEF Inno-centiyê www.unicef-icdc.org
- Komîseriya Bilind ya Mafên Mirovan ya Neteweyên Yekbûyî www.ohchr.org
- Tevna Agahiyên Li Ser Mafên Mirovan (CRIN) home.crin.org
- Save The Children www.savethechildren.net
- Yekîtîya Mafên Mirovan (Children's Rights Alliance) www.childrensrights.ie
- Plan International www.plan-international.org
- Human Rights Watch www.hrw.org
- Rêxistina Navneteweyî ya Efûyê www.amnesty.org

## Hevpeyman, belge û qanûnên neteweyî û navneteweyî yên li ser mafên mirovan

- Hevpeymana Mafên Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî https://www.unicef.org/tur-key/crc/_cr23c.html
- Protokola Pêvek ya Parastina Zarokan ji Şerên Çekdarî https://www.ombuds-man.gov.tr/contents/files/6314--Cocuk-Haklari-na-Dair-Sozlesmeye-Ek-Co-cuklarin-Silahli-Catismala-ra-Dahil-Olmalari-Konusun-daki-Secmeli-Protokol.pdf
- Protokola Hişyarîya Ji Bo Firotin, Fahîşetiya Zarokan û Pornografiya Zarokan https://humanrightscenter.bilgi.edu.tr/tr/content/125-co-cuk-haklarna-dair-sozlesme-ye-ek-cocuk-sats-cocuk-fa-hiseligi-ve-cocuk-pornografi-si-ile-ilgili-ihtiyari-protokol/
- Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan https://www.unicef.org/turkey/udhr/_gi17.html
- Hevpeymana Navneteweyî ya Mafên Kesane û Siyasî http://www.un.org.tr/humanri-ghts/images/pdf/3-MedeniVe-SiyasiHaklaralliskinSozlesme.pdf
- Hevpeymana Navneteweyî ya Mafên Ekonomîk, Civakî û Çandî http://www.un.org.tr/humanri-ghts/images/pdf/4-Ekonomik-SosyalKulturelHaklarSozles-mesi.pdf
- Hevpeymana CEDAWê ya Tinekirina Cidaxwaziya Li Jin û Zarokên Keç https://www.unicef.org/turkey/pdf/_gi18.pdf
- Hevpeymana Stenbolê https://rm.coe.int/1680462545
- Pîvanên Neteweyên Yekbûyî yên ji bo rêlibergirtina sûcda-riya zarokan (Pîvanên radîkal/hişk) http://cocukhaklari.barobirlik.org.tr/dokuman/mevzuat_ua-kararlar/cocuksuclulugununon-lenmesi.pdf
- Standardên Herî Kêm ên Nav-neteweyî yên Pêkanîna Edaleta Ji Bo Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî(Qaîdeyên Pekînê) http://cocukhaklari.barobirlik.org.tr/dokuman/mevzuat_ua-kararlar/cocukadaletsistemini-nuygulanmasi.pdf
- Qaîdeyên Neteweyên Yekbûyî yên Ji Bo Zarokên Ji Azadiyê Mehrûm Bûyîn(Qaîdeyên Ha-vanayê) http://cocukhaklari.barobirlik.org.tr/dokuman/mevzuat_ua-kararlar/ozgurlugundenyok-sunbirakilmis.pdf
- Qanûna Parastina Zarokan http://cocukhaklari.barobirlik.org.tr/dokuman/mevzuat_ka-nun/cocukkoruma.pdf
- Nexşeplan û Belgeya Mafên Zarokan ên Navne-teweyî(2013-2017) https://cocukhizmetleri.aile.gov.tr/uploads/pages/yayinlar/ulusal-cocuk-haklari-strate-ji-belgesi-ve-eylem-plani.pdf

## Malperên rêber

- Kitêbxaneya Nûçegihaniya Zarokparêz ya bianetê http://haberdecocuk.org
- Database-a Dozên Derbarê Zarokan De yên li DMMEyê Vebûne http://www.cocukgozlemevi.org/aihm
- Çavdêriya li mafên zarokan www.cocukhaklariizleme.org
- Em Li Pêşiya Tûndkariya Li Zarokan Dibin Asteng http://www.cocugasiddetionluyoruz.net

# Serhatiyên rojnamegeran



*Me li odeyeka nexweşxaneyekê hev dît. Hê zarok dihat dermankirin. Bavê wê tûndkarî li wê û dayika wê kiribû*

*Dayikê dest bi gotina çîroka xwe kir. Wê dê doz vekira û bi rêyên hiqûqê li mafên xwe bipirsaya. Keçika biçûk 12-13 salî bû. Dema dora axiftinê hat wê got: “Ma çênabe ku tu nenivîsî?” Min li bîra wê anî ka ez ê çawa nasnameya wê veşêrim. Min jê re got em ê navekê kod lê bikin û ti kes dê wê û dayika wê nas nekin. Digel ku dayika wê qebûl jî kiribû wê nedixwest. Min deng-gir girt. Min ew nûçe çênekir.*

*Wê ji bo doza xwe biryar dabû ku dê nehînî bûya. Min jî rêz li biryara wê girt. Rojnameya min jî gelek israr nekir. Arşîva rojnamegeriya li Tirkiyeyê bi wan nûçeyên ku zarok mexdûr kirîne, tejî ye.*

*Nûçe hene, navan, paşnavan bi zelalî dinivîsin, gotinên wek “diz”,”qatil”,”tînerkêş” li wan dikin... Hin kesên tundkarî lê hatîn kirin tête îfşakirin. Li ser başî û xerabiya kiriyarên wan şîrove hene... Nûçeyên li ser zarokan ew qasê mijareka hessas e ku çênabe bi hêviya wijdana nûçegihan û edîtoran ve bê hiştin. Divê ji qunciknivîskaran heta nûçegihan û edîtoran ji bo her kesan ji bo malper, kovar û hemî pêkhateyan hin qaîde bêne danîn. Divê xebatkar bêne perwerdekirin, rêber hebin, bêne kontrolkirin û ev kêşe ji binî ve bê rakirin.*


**Demet Bilge Erkasap, Edîtor, Rojnameya Hurriyetê**



*Digel ku azadiya rojnamegeriyê mafekê di Qanûna Bingehîn de ye jî azadî bi xwe ne bêsînor e. Parastina mafên zarokan yên kesane bi qanûnan têne diyarkirin. Etîka rojnamegeriyê jî berjewendiya zarokan didane pêşiya her tiştan.*

*Digel heyîna vê mertala qanûnî, nûçe têne çêkirin ku mafên zarokan binpê dikin. Tesîra neyînî li pêşketina psîkolojîk û fizîkî dike. Em vê yekê bi taybetî di nûçeyên salên 90an û nûçeyên medyaya navendî dibînin. Rojnameger welê nîşan didin ku ew nasnameya zarokên îstismar lê hatî kirin vedişêrin lê ew navê kolan, dibistan, tax û navçeyan bi eşkereyî dinivîsin. Di nûçeyê de hûrgilîyên tûndkariya li zarokan hene lê şertên tûndkariyê û rêyên çareseriyê nînin. Yek jii tiştên dî yên em dibînin jî ew e ku dema alîkariya maddî ji bo zarokên li taxên feqîran têne kirin mafên zarokan yên kesane têne binpêkirin. Herweha di nûçeyên li ser nexweşiyan de jî hin nûçeyên welê têne çêkirin ku nayê fikirîn ka dê tesîreka çawa li paşeroja zarokan bike.*

**Gürkan Akgüneş, Alîkarê, Alîkarê Midûrê Nûçeyên Lêkolînê, Rojnameya Milliyetê**



*Nûçeyên zarok tê de piraniya caran li ser rewşên ji rêzê an jî bûyerên hatîn serê wan in Zarok dişewitin, dikevin, di avahiyan de girtî dimînin, tecawiz li wan tê kirin, kûçik leqan li wan dike(wan gez dikin) an lêdanê dixwin. An jî bi delaliya xwe hestek efsûnî dide, qerneya xwe(encamnameya notên dersan) distîne. Bi vî awayî li medyaya navendî dikare wek zarokokekê cih bigire. Her roj ev têgeh ji nû ve tê çêkirin.*

*Nûçe roleka xerab dilîze, rê dide îstismara li zarokan meşrû bibe û zarok bibin objeyek. Rola nûçegihaniya mafparêz li vê derê dest pê dike. Di Hevpeymana Mafên Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî de "berjewendiya bilind ya zarokan" heye. Ji bo nûçegihaniya mafparêz ev noqteyeka destpêkê ya meşrûbûnê ye. Ev gavek e ku heyina wan kesan wek zarok li nûçegihanan dide qebûlkirin û ber bi îdraqkirina karaktera wan ve dibe. Li gor min sînorê medyaya navendî yê biryaran dide û medyaya mafparêz ya azadiyê dide ev e. Lê ev bi tenê destpêkek e. Da ku ji nûçeyan bîner û xwîner zewqê bistîne û agehdar bibin divê rêyên xweîfadekirinê ji bo zarokan bêne vekirin. Divê xweseriya zarokbûna wan di honandina nûçeyan de bê bicihkirin. "Nûçegihaniya Zarokparêz" ew nûçegihanî ye ku heq dike ji bo nûçegihanên siberojê bibe beşeka perwerdebûnê.*

**Nilüfer Zengin, Editör, bianet (2007-2008)**





*Cara pêşiyê wek nûçegihanekê çûm bianetê û min ev gotinên Prof. Dr. Oğuz Polatî di nûçeya xwe ya yekem de nivîsîbû "ya giring ew e ku mafên zarokan bikare bibe beşeka rojeva civakê." Nîsana 2014ê... Dema min dest pê kir ku min nûçeyên li ser mafên zarokan şopand. Min ferq kir ka ez çi qasê jê nizanim.*

*Ne min bi wî çavî li zarokan nêrîbû ne jî min bi çavên zarokan li jiyanê nêrîbû. Paşê min keşif kir ku bi dehan sazî û kes hene ku ji bo mafên zarokan dixebitin, di tevgeran de ne lê dengê wan nayê bihîstin. Lê xebatên wan bi medyayê nedikarîn di nav civakê de belav bibe, polîtîk bibe. Ji ber wê jî bandora wê di sînorekê teng de dima. Ya ji wê jî zêdetir zarok wek "kesên temam nebûyîn" dihatin dîtin û tiştên rasterast wan eleqedar dikin jî ji wan nedihat pirsîn.*

*Ev fikir bi xwe jî wek absûrt tê dîtin. Ji bo nimûne dema bê fikirîn ku ji bo taxekê parq lazim e an na ji wan zarokan nedihat pirsîn. Lê heke parq bê çêkirin ew zarok dê lê bileyîzin. An jî dema nûçeyek li ser zarokên karker bê çêkirin, bi jimar û reqeman nûçeyên sar têne çêkirin lê nayê bîra ti kesan ku serhatiyên zarokekê/a karker ji wan bipirse. Berevajiyê vê medyaya navendî piraniya caran li dijî etîka karkirinê û heta ku li dijî qanûnan jî tev digerin û mafên zarokan bi vî awayî binpê dikin. Ji 15 salan zêdetir e ku bianet nûçegihaniya zarokparêz/zaroknavend dike. Vê yekê deriyek li dîwarekê vekir. Hêvî dikim rojnamegerên bi wî deriyî re diçin zêde bibin.*

**Erhan Üstündağ, Editör, bianet (2004-2011)**

# Ferheng

**Agehdarkirina edlî:** Di bûyerên îstismara zarokan an jî gumana îstismara zarokan de standina raporeka fermî û agahdarkirina aliyên peywendîdar ên fermî ye. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Bajarên dostên zarokan:**Ew bajar e ku hêza xwe dide bicihanîna mafên zarokan. Mafên zarokan di kiriyaran, bûtçeyê, yasa û bernameyan de cih digire. Mafê zarokan ên standina xizmetên ji bo saxlemî û pewerdeyê, lîstina bi hevalên xwe re, beşdarbûna çalakiyên çandî û civakî didane pêşiya xizmetên dî. Asta pêdivîyên taybet çi bin bila ew bin ji bo zarokan rê tê dayin ku bigihîn xizmetên civakî. *(UNICEF 2016)*

**Baliqbûn:** Demê derbasbûna kamilbûnê ye. Ji aliyê derûnî û fizîkî ve zarok derbasî demê kamilbûnê dibe. Dema kamilbûna ji bo çêkirina zarokan dest pê dike. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Berjewendiyên bilind ên zarokan:** Maf û hewceyîyên zarokan li pêşiya her tiştên dî ye. *(BM ÇHS)*

**Berpirsiyarîya cezayî:** Li gor Qanûna Cezayan a Tirkan şiyana têgihiştina tiştên ku dikarin ûnsûrên sûcî be ya zarokên ji 12 saliyê mezintir e. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Bersûc:** Ew kes in ku ji dema amadekirina îdianameyê û vekirina dozê heta dadgeh biryarê didin, guman heye wan sûc kiribe. *(Nûçegihaniya zarokparêz)*

**Beşdariya zarokan:** Guhdariya fikrên zarokan, qedirdayina fikrên wan, beşdariya wan a di pêvajoyên biryardanê de ye. *(Têgeha zewicandina zarokan û têgehên têkildar)*

**Dadgeha zarokan:** Ew dadgeh in ku li her bajarî û her navçeya serjimara welatiyên wê ji 100 hezarê zêdetir e heye. Ew dozên li derveyî sûcên giştî ne û sûcdar ji 15 saliyê biçûktir in li wê derê têne bi rê ve birin. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Dê û bavbûna ji bo zarokan:** Ew rewş e ku bi awayekê fermî welayeta zarokên ti rê nemaye bi dê û bavê xwe yên biyolojîk re bijîn *(Wezareta Xebat, Malbat û Xizmetên Civakî, 2019)*

**Desteserkirin:** Li gor yasayan bêyî ku zerer li saxlemiya kesan bibe ji bo demekê astengkirina azadiya wan e. Ew dem ji girtina kesan dest pê dike heta saziyên edlî biryara berdan an jî girtina wan dide dewam dike. *(Rojnamegeriya zarokparêz)*

**Dibistanên dostên zarokan:** Ew dibistan in ku qîmetî didin çalakiyên hûnerî, dostên derdorê ne, ji bo zayendan hessas in, zarok beşdarî birêvebiriyê dibin, berpirsiyarîya wan heye. *(UNICEF 2002)*

**Gumanbar:** Ew kes in ku di dema lêpirsîna sûcekê de guman heye wan ew sûc kiribe.*(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Hêlînên zarokan:** Grêdayî Saziyên Xizmetên Civakî û Parastina Zarokan e. Erkê wan saziyan ew e ku zarokên emrê wan di navbera 0-12ê de ji aliyê bedenî, perwerdeyî, psîkososyal ve digihînin. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Hilbijartina zayendê û kûrtaj:** Di dema ducanîbûnê de, bi kûrtajê standina zarokên keç e. Li çandên paderşah de, qedrekê zêde ji bo bebikên kur tê dayin û ji bo kûrtajkirina bebikên keç guvaşa civakî tê kirin. *(Têgeha zewicandina zarokan û têgehên têkildar)*

**Ixmala tibî:** Ew rewş e ku zarok saxlem e lê ji ber ku derziyên wan nehatine kirin, dema nexweş bûyî ji bo dixtoran nehatiye birin, pêşniyarên tedawîkirinê nehatine pêkanîn, berçavik, gopal û hewceyî nehatine pêkanîn. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Îfade standin/Jêpirsîn:** Ew dem e ku dadger û dadgeh li ser sûcekê guh dide gotinên gumanbar û bersûcan. *(Nûçegihaniya zarokparêz)*

**Îfadestandin:** Ew kiriyar e ku ew kesên guman heye wan sûcek kiribe li ser wî sûcê gumanbar agahiyan dide hêzên ewlehiyê. *(Rojnamegeriya zarokparêz)*

**Îstismara cinsî ya li zarokan:** Ew bûyer e ku kesên emir-mezin ji bo têrbûna cinsî zarokan bi kar tînin. Îstismara cinsî ya li zarokan, têkiliya cinsî ya anal, vajînal, oral, destlêdana organên cinsî, lê temaşekirina fîlmên pornografîk, teşhîrkarî, bikaranîna di pornografiyê û fihûşşê de hwd... ye. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Îstismara zarokan:** Kirina wan kiriyarên zererê didin pêşketina fizîkî, hestebarî, fikirî û civakî yên zarokan e. Têkbirina zarokatiyê ye. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Îxmal: E**w rewş e ku hewceyîyên bingehîn ên zarokan yên wek xwarin, starbûn, parastin, jê hezkirinê ji bo wan nayê pêkanîn. Ev yek bandoreka neyînî li pêşketin û guihana zarokan dike. *(Têgeha zewicandina zarokan û têgehên têkildar)*

**Îxmala perwerdeyê:** Ew rewş e ku zarok têne emrê pewerdebûnê de lê belê naçin dibistanan an jî ji bo dibistanan nayên şandin. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Lêpirsîn:** Ew pêvajo ye ku aliyên bi qanûnan hatine erkdarkirin(hêzên ewlehiyê, dozgerî) ji dema gumana sûcî heta amadekirina îdianameyê bi rê ve dibin. *(Nûçegihaniya zarokparêz)*

**Lêxwedîbûna saziyan:** Ew rewş e ku bi raporên fermî tê eşkerekirin ku malbata hin zarokan li wan nabin xwedî an jî xwedîbûna wan metirsîyên dî çêdike. Li ser vê yekê dewlet wan dide saziyên fermî yên wek Hêlînên Zarokan, Wargehên Gihandinê, Navendên Ciwan û Zarokan û Navendên Parastin, Xwedîkirin û Rehabîlîtasyonê *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Malbata lê xwedî:** Ew rewş e ku welayeta zarokan li nik malbata wan e lê ji bo demekê biryar tê dayin ku ew ê nekarin xwedî bikin. Li ser vê yekê dewlet wan dide kes an malbatan ku zarok pêşketina xwe ya perwerde, civakî û saxlemiyê temam bike. Ev kar bi dildarî jî û bi pereyî jî tê kirin. *(Wezareta Xebat, Malbat û Xizmetên Civakî, 2019)*

**Malbatbûna dildarî:** Bernameyek e ku piştgiriya jiyana zarokên li saziyan dijîn dike. Zarok dikarin Şemî û Yekşeman û rojên betlaneyê li malan bibin mêvan. *(Wezareta Xebat, Malbat û Xizmetên Civakî, 2019)*

**Miameleya xerab:** Ew miamele(tevger û kiriyar) in ku zererê dide pêşketina fizîkî, derûnî û civakî ya zarokan. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Mirina dayik û bebikan:** Ew metirsî ye ku dema zarok ji dayika xwe dibe çêdibe ku herdu jî bimirin. Ev metirsî ji bo dayikên di emrê zarokatiyê de zewicîn çar qetan zêdetir e. *(Têgeha zewicandina zarokan û têgehên têkildar)*

**Mûdafî:** Ew parêzer in ku gumanbar û bersûcan di dadkirina cezayî de diparêzin. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Navendên zarok û ciwanan:** Saziyên civakî ne. Ciwan û zarokên ji ber lihevnekirina dê û bavan, feqîrî, terkkirin, nexweşî, metirsiya civakî li derve mayîn li wan saziyan bi cih dibin rehabîlîte(dermankirina derûniya) wan têne kirin. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Pedofîlî:** Nexweşiya wan kesên kamilbûyî ye ku ew zarokan ji aliyê cinsî ve dilkêş dibînin. Nexweşiyeka psîkoseksûel e ku ji aliyê cinsî ve mêla wan kesên mezin li ser zarokan e. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Pêvajoya dadkirina fermî:** Ew pêvajo ye ku ji qebûlkirina îdianameyê dest pê dike û heta biryara dadgehê dewam dike. *(Nûçegihaniya zarokparêz)*

**Pornografîya zarokan:** Nîşandana zarokan a di çalakiyeka cinsî de ye, ew çalakî dikare rast an jî honandî(fiction) be. Nîşandana hin cihên laşê zarokan e. *(Sevi Yıldız 2009)*

**Sûc:** Ew çalakî ne ku qanûn rê nadin ew bêne kirin. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Sûcdar:** Ew kes in ku dadgehan biryar daye wan sûc kiriye. (kesinleşmiş) kişi. *(Nûçegihaniya zarokparêz)*

**Taciza zayendî/cinsî:** Bi mexsedên cinsî bi rêyên cida acizkirina kesan e. Fîzdan, şandina peyamên bi mexsedên cinsî, teqîbkirina bi mexsedên cinsî sûcên tacizê ye. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Têkçûna bi stresê ya piştî travmayan:** Dikare gelek caran hest bike di bûyera travmatîk de ye, sêra razanê diguhere, refleks dikare ji normalê zêdetir be. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Tevgerên dostaniya digel zarokan:** Ew rabûn, rûniştin û tevgeriyan in ku mafên zarokan diparêze. Kesên derdorê tiştên bi dilê zarokan dikin. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Ticareta zarokan a bi mebesta kiriyarên cinsî/zayendî:** Ew kiriyar e ku zarok ji cihekê(nêzîk an dûr) ji bo cihekê dî ji bo îstismara cinsî ya mezinan têne birin. *(ÇAÇAV 2015)*

**Vasî:** Di hin rewşên yasayî de ew temsîlkar e ku dadgehê ji bo kesên pêdivîyên wan heyîn an jî biçûk erkdar kiriye. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Warê Sêwîyan:** Ew saziyên xizmetên civakî ye ku zarokên hewce ne bêne parastin diparêze. Xwedîtîyê li wan dike û wan dike kesên kêrhatî yên civakê. Ji bo zarokên 13-18 salî ye. Heke ji

bo dewamkirina parastina wan biryar bê dayin dikare kesên ji 18 saliyê mezintir jî biparêze. *(Qanûna Xizmetên Civakî û Saziya Mîhrîvaniya Zarokan a 2828ê)*

**Wekîl:** Parêzerên wan kesên beşdarî sûcekê bûyîn, ji sûcekê zerer li wan bûyîn in. *(Nûçegihaniya zarokparêz)*

**Welayet:** Maf û destûra qanûnî ya dê û bavan(an jî hem dê hem bav) e ku zarokên baliq nebûyîn temsîl dikin. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Xeta gihandina hewarê-Elo 183:** Elo 183, Xizmeteka Wezareta Malbat û Xizmetên Civakî ye. Ji bo malbat, zarok, kesên pêdivîyên wan ên taybet heyîn, pîr, malbatên şehîd û xazîyan xeta îxbar û şêwirmendiyê ya xebatên li dijî îstismarê, bûyerên tûndkariyê, kuştina ji ber namûsê ye.

**Zarokên ku li kolanan dijîn:** Ew zarok in ku têkiliya wan a bi malbata wan re qismî an jî temamî hatiye birîn û li kolanan dijîn. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

**Zarokên li kolanan dixebitin:** Hin ji wan zarokên li kolanan kar dikin bi malbata xwe re di têkiliyeka daîmî de ne. Di bin kontrola wan de dijîn. Hinek zarok jî bi temamî li derve dijîn.

**Zayenda civakî:** Rolên civakê çêkirî û hîn dike yên mêr û jinan in. Zayenda civakî rê dide me ku em qalibên rol û tevgeran, berpirsiyarî, çavkanî û jêcidayîya bibînin. *(Têgeha zewicandina zarokan û têgehên têkildar)*

**Zewicandina zarokan/Zewaca di emrê zarokatiyê de:** Ew zewac e ku hevserek an jî herdu hevser ji 18 saliyê biçûktir e/in.

**Zordariya kesên di heman emrî de:** Ew rewş e ku zarokên ji aliyê fizîkî û rewşên dî ve lawaz in, rastî tevgerên neyînî yên fizîkî, gotinên xerab, zayendî û hestebarî yên zarokên dî yên di heman emrî de tên. *(Têgeha îhmal û îstismara zarokan)*

## Çavkaniyên Ferhengê


Akço, Seda ve Onat, Yasemin, "Çocuk ve Habercilik", Çocuk Odaklı Habercilik içinde, Alankuş Sevda (der.), Hak Haberciliği Dizisi, BİA-IPS İletişim Vakfı Yayınları, İstanbul, 2007.

Doğan, Selen (haz.), Erken Yaşta Evlilik ve İlişkili Terimler Sözlüğü, Uçan Süpürge Kadın İletişim Derneği, 2013.

Aile, Çalışma ve Sosyal Hizmetler Bakanlığı, Koruyucu Aile, 2019.

Alo 183 Destek Hattı, Aile, Çalışma ve Sosyal Hizmetler Bakanlığı, 2018.

Beyazova, Ufuk ve Şahin, Figen, Çocuk İhmali ve İstismarı Terimleri, Sözlük Dergisi, Gazi Üniversitesi Çocuk Koruma Merkezi, 2006.

Cinsel Amaçlı Turizm ile Mücadele, 2008.

Cinsel Şiddetle Mücadele Derneği, Doğru Kelimeleri Kullanmak, Cinsel Şiddet Üzerine Haber Oluşturmak, 2017.

ÇAÇAV, Çocuklara Yönelik Ticari Cinsel Sömürü Ne Demektir, 2015.

Çocuklara Yönelik Ticari Cinsel Sömürüyle Mücadele Ağı

Kadem, Erken Yaşta ve Zorla Evliliklere Karşı Mücadele Çalıştay Raporu, 2018.

UNICEF, Çocuk Dostu Şehirler, 2016.

# Çavkanî


Akdağ, Çilem Tuğba, Yeni Medyada Çocuk Haberciliği: "Milliyet Çocuk", "Hürriyet Çocuk" ve "Cicicee Çocuk Deyince" Sayfalarının İncelenmesi, Ileti-s-im Cilt 25, 2016

Alankuş , Sevda (der.), Çocuk Odaklı Habercilik, Hak Haberciliği Dizisi, BİA-IPS İletişim Vakfı Yayınları, İstanbul, 2007.

Birleşmiş Milletler Çocuk Haklarına Dair Sözleşme,1989

Çobaner, Aslıhan Ardıç, Çocuk Hakları Bağlamında Suriyeli Mülteci Çocukların Haberlerde Temsili, Marmara İletişim Dergisi, Sayı 24, 2015.

Hrant Dink Vakfı, Türkiye Yazılı Basınında Çocukların Temsili, Aralık 2018.

Eğitim Reformu Girişimi, Eğitim İzleme Raporu 2017-2018, http://www.egitimreformugirisimi.org/egitim-izleme-raporu-2017-18-2/

Fırat, Feyyaz, Çocuk Odak 'sız' Habercilik: İnternet Gazetelerinde Çocuk İçerikli Haberlerin Sunumu ve Etik İhlaller. Gümüşhane Üniversitesi İletişim Fakültesi Elektronik Dergisi, Cilt 4, Sayı 2, 2016.

McCrum, Sarah ve Bernal, Paul, Interviewing Children: A Training Pack for Journalists, Children's Voices, 1994

Ova, Nalan, Türkiye'de Yazılı Basında "Çocuk Gelinler"in Temsili, Selçuk İletişim Dergisi Cilt 8, Sayı 2, 2014.

Tunç, Aslı, Haber Taraması (16, 20 ve 24 Nisan 2018), 2018.

Üstündağ, Erhan ve Şık, Ahmet, Bia-UNICEF Diyarbakır Semineri, 17-18 Aralık 2005.

UNICEF, Çocuk Hakları ve Gazetecilik Uygulamaları, Hak Temelli Persfektif, 2007

The Media and Children's Rights

Doğru Kelimeleri Kullanmak, Cinsel Şiddet Üzerine Haber Oluşturmak, Femisto, Cinsel Şiddetle Mücadele Derneği, 2017.


## Malper


Midûriya Giştî ya Qeyda Edlî û Statîstîkan ya Wezareta Dadê, Statîstîkên Edlî 2017.

Navenda Lêkolînên Civakî û Ekonomîy ya Zanîngeha Bahçeşehîrê(BETAM), Her Üç Çocuktan Biri Maddi Yoksunluk İçinde, 2014.

Navenda Nûçeyan a BIAyê, CHP'li Vekil Ali Şeker: 18 Ayda 22 bin Çocuk Anne Oldu, Bağımsız İletişim Ağı (bianet), 2018.

Demir, Ergün, "Oğluma pantolon alamıyorsam niye yaşıyorum" dedi, kendini astı, Astakos Haber, 21 Eylül 2018.

Navenda Nûçeyan a Evrenselê, "Bakanlık açıkladı: 3 bin 13 çocuk cezaevinde", Evrensel, 14 Kasım 2018.

T.C. Milli Eğitim Bakanlığı Hayat Boyu Öğrenme Genel Müdürlüğü, Geçici Koruma Kapsamı Altındaki Öğrencilerin Eğitim Hizmetleri 2018-2019.

T.C. Milli Eğitim Bakanlığı, Milli Eğitim İstatistikleri Örgün Eğitim 2017-2018.

Türkiye İstatistik Kurumu, Çocuk İşgücü Anketi Sonuçları, 2012.

Türkiye İstatistik Kurumu, İstatistiklerle Çocuk, 2017.